Di roja me de edebîyatên klasîk yên mîletên Misilman êdî bûne malê tarîxê. Lewra sîstema îdarî, civakî, çandî û dînî ya ku ev edebîyat derxistiye meydanê ji holê rabûye û ber bi sîstemeke nû ve veguherîye ku ew jî sîstema Rojavayî ye. Lêbelê edebîyatên Îslamî gelek in û seyra tarîxî ya qonaxên avabûn, geşedan û dawîlêhatina wan ji hev cuda ne. Dema mirov ji vî alîyî ve li edebîyata Zazakî ya klasîk dinêre mirov dibîne ku ev edebîyat hem di çarçoveya edebîyata Kurdî de hem jî di çarçoveya edebîyatên dî yên Îslamî de wek edebîyateke gelekî ciwan derdikeve pêş. Di esasê xwe de edebîyata Zazakî ya klasîk piştî dawîlêhatina serdema edebîyatên klasîk derketîye meydanê. Bi awayekî balkêş sedsala XXem ku edebîyatên dî yên klasîk hukmê xwe tê de winda kirine yan jî lawaz bûne ji bo edebîyata Zazakî bûye sedsala avabûn û geşedanê. Dema edebîyata Zazakî ya klasîk derketîye meydanê li cîhana Îslamê di encama guherînên sîyasî, civakî û hwd. de serdestîya bihêz a edebîyata klasîk êdî nemaye û vê edebîyatê cihê xwe ji edebîyata modern re hêlaye. Yanî derketina edebîyata Zazakî ya klasîk tam jî rastî serdema pêşketina edebîyata modern tê. Loma jî eger mirov avabûna edebîyata Zazakî ya klasîk wek avabûneke derengmayî ya paşwext û edebîyata Zazakî ya klasîk jî wek edebîyateke derengmayî pênase bike dê ne şaş be.

Ev derengmayîna paşwext wek taybetîyeke bingehîn a edebîyata Zazakî ya klasîk derdikeve pêş û ev edebîyat di nav dîyalektên edebî yên Kurdî û di nav edebîyatên dî yên Îslamî de bi vî alîyê xwe balê dikişîne ser xwe. Bêguman ev rewşa wê bi xwe re gelek pirsan jî tîne ku hêjayî analîzê ne: Gelo edebîyata Zazakî çima berî vê serdema dereng nekarîye edebîyata xwe ya klasîk saz bike? Gelo di serdema dawîlêhatin/lawazîya edebîyata klasîk a Îslamî de derketina edebîyata Zazakî ya klasîk bi çi faktoran ve girêdayî ye? Gelo edebîyateke ku di wextekî weha de bi

derengî derkeve meydanê ji alîyê kapasîte û nîrxê edebî ve di çî rewşê de ye? Gelo edebîyateke ku piştî serdema klasîzma Îslamî derkeve meydanê bi klasîzma edebî ya Îslamî re çiqasî digunce? Armanca vê gotarê ew e ku di çarçoveya van pirsan de cihê edebîyata Zazakî ya klasîk di nav dîyalektên edebî yên Kurdî û bi giştî jî di nav edebîyatên Îslamî de bê tesbîtkirin û li ser kapasîte û nîrxê wê yê edebî hin analîz bîn analîzkirin.

Bêguman metnên damezirîner ên edebîyata Zazakî ya klasîk, çawa ku li nav gelek mîletên dî yên Misilman jî wisa ye, ne tenê metnên edebî ne ew di heman demê de belgeyên tarîxî ne ku destpêka derbasbûna wî zimanî bo nivîsê jî destnîşan dikin. Ji ber ku metnên damezirîner ên edebîyata Zazakî ya klasîk di heman demê de metnên pêşî yên zimanê Zazakî ne jî gotar di heman demê de bi tarîxa zimanê Zazakî re jî eleqedar e.

Di gotarê de berî her tiştî di peywenda dîyalektên edebî yên Kurdî û edebîyatên dî yên Îslamî de avabûna edebîyata Zazakî ya klasîk wek edebîyateke derengmayî dê bi awayekî berawirdî bê destnîşankirin. Piştî di beşên serbixwe de pirsên “Edebîyata Zazakî ya klasîk çima biwext derneket meydanê?” û “Edebîyata Zazakî ya klasîk di serdemeke dereng de çawa derket meydanê?” dê bîn bersivandin. Piştî qonaxên edebîyata Zazakî ya klasîk û mehsûlên wê yên edebî dê bi awayekî sistematîk bîn analîzkirin. Piştî jî di çarçoveya hunera edebîyatê û klasîzma edebî de rengvedana nerênî ya derengmayîne ya li ser vê edebîyatê dê bê pêşkêşkirin. Di beşa encamê de jî li ser cihê edebîyata Zazakî ya klasîk di nav edebîyatên Kurdî û Îslamî de dê hin analîz bîn kirin.

### **1. Di Peywenda Dîyalektên Edebî yên Kurdî û Edebîyatên Îslamî de Avabûna Edebîyata Zazakî ya Klasîk Wek Edebîyateke Derengmayî**

Hemû daneyên li ber destan nîşan didin ku edebîyata Zazakî ya klasîk bi mewlûdên Melayê Xasî û Osman Es'ed Efendîyo Babij di dawîya sedsala XIX û destpêka sedsala XXem de li devera Diyarbekirê derketîye meydanê (mewlûda Xasî: Hezan/Lice, 1886; mewlûda Babij: Sêwreg, 1903). Edebîyata Zazakî ya klasîk piştî vê qonaxa avabûnê di sedsala XXem de ji Diyarbekirê heta bi Çewlîgê (Bîngol) di sahayê berfirehtir de belav bûye û di vê sedsalê de bi dayîna berhemên nû hebûna xwe domandîye.

Ji alîyê serdema avabûn xwe ve edebîyata Zazakî ya klasîk di nav edebîyatên Îslamî de ku Kurdî jî beşek jê ye cihêkî xwe yê taybet heye. Lewra ev edebîyat li gor edebîyatên dî yên Îslamî di qonaxêke pir dereng a tarîxa Îslamê de derketîye meydanê ku di vê qonaxê de êdî edebîyata klasîk wextê xwe xilas kirîye. Di esasê xwe de edebîyatên klasîk ên Îslamî mehsûlê serdema klasîk a tarîxa Îslamê ne ku di wê serdemê de bi sistema xwe ya îdarî û sazîyên xwe yên klasîk (medrese û tekya) çandêke xweser a mîletên Misilman heye û edebîyata klasîk jî mehsûlê vê çandê ye. Ev serdema klasîk ji destpêka Îslamîyetê dest pê dike (sedsal VII) û heta bi dawîya sedsala XVIIIem dewam dike ku ji alîyê qonaxên klasîk ên tarîxa Ewropî



ve beramberî qernên navîn û qernên nû tê. Di vê maweyê de li nav miletên Misilman çanda serdest çanda Îslamî û edebîyata serdest jî edebîyata klasîk a Îslamî ye. Piştî ku ji dawîya sedsala XVIIIem şûnde ji aliyê leşkerî û çandî ve cîhana Îslamê dikeve bin bandora çanda Rojavayê, di tarîxa Îslamê de serdema klasîk cihê xwe dide serdemeke nû ku wek serdema modern a tarîxa Îslamê tê binavkirin.<sup>2</sup> Di vê serdema nû de êdî çanda Rojavayî nifûzî nav miletên Misilman dike û her di vê çarçoveyê de li kêleka edebîyata klasîk a Îslamî di bin bandora edebîyata Rojavayê de edebîyateke nû jî derdikeve meydanê. Bi vî awayî di destpêka serdema modern a tarîxa Îslamê de li nav miletên Misilman hem edebîyata Îslamî hem jî edebîyata Rojavayî bi hev re tîn dîtin ku ev yek, bo nimûne, ji bo edebîyata Osmanî serdema piştî îlankirina Tenzîmatê (1839) heta bi dawîlêhatina dewleta Osmanî destnîşan dike. Lêbelê ev nayê wê wateyê ku her du terzên edebîyatê hebûna xwe di heman astê de û bi heman hêzê didomînin. Berevajîyê wê her ku diçe edebîyata modern pêş dikeve, edebîyata klasîk jî paş dikeve. Di serdema dewletên nû yên sedsala XXem de edebîyata klasîk êdî bi tevahî dibe malê tarîxê. Lêbelê herçiqas li nav miletên wek Erebb, Tirk û Îranîyan ku bi destê sazîyên dewletê derbasî modernîzasyonê bûne rewş weha be jî li nav miletên bê dewlet ku derfeta bidestxistina modernîzasyonê nedîtine rewş jî vê yekê cudatir e û tu guman tune ku Kurd jî bo vê yekê nimûneyeke girîng in. Bi gotineke dî; miletên ku di tarîxa xwe de zimanê fermî yê dewletê wek zimanê edebî yê standart saz kirine bi avakirina dewletên modern re li şûna edebîyata klasîk edebîyateke nû îqame kirine. Lêbelê li nav miletên bê dewlet û xwedî dîyalektên edebî pêvajoya modernîzasyonê û derbasbûna edebîyata modern bi derengî ketîye. Guman tune ku ev derengmayîn jî bo edebîyata klasîk a van miletan ne xaleke erênî ye. Lewra edebîyatên klasîk ên ku di serdema klasîk de derketine meydanê li gor ruhê serdema xwe ne, lêbelê edebîyatên klasîk ên ku di serdema modern de hebûna xwe domandine yan jî ji nû ve derketine meydanê bivênevê dê ji ruhê serdema xwe dûr bimînin.

Di serdema ku Erebb, Tirk û Îranîyan dest bi edebîyata modern a Rojavayî kiribûn, ku ev yek bo nimûne li nav Osmanîyan rastî serdema Tenzîmatê (1860-1895) tê, li nav Kurdan di çarçoveya serdema Xalidîtiyê de bizaveke bihêz a edebîyata klasîk heye. Lêbelê bi dawîlêhatina dewleta Osmanî û avabûna dewletên nû re ev serdestiya Xalidîtiyê jî dest diçe. Di nav şertên dijwar ên sedsala XXem de, di çarçoveya şopandina edebîyatên serdemên mîrektîyan û Xalidîtiyê de be jî edebîyata Kurdî ya klasîk bi awayekî hebûna xwe didomîne. Lêbelê ji ber nebûna şertên guncaw bivênevê edebîyata klasîk a vê serdemê jî aliyê klasîzma edebî ve lawaz dimîne.

Eger em bînin bîra xwe ku serdema modern a tarîxa Îslamê beramberî sedsalên XIXem û XXem tê em ê bibînin ku derketina edebîyata Zazakî ya klasîk beramberî dawîya qonaxa yekem a serdema modern (dawîya sedsala XIXem) û belavbûna wê jî beramberî qonaxa duyem a serdema modern (sedsala XXem) tê. Piraniya

<sup>2</sup> Davut Dursun, "İslâm (Günümüz İslam Dünyası)", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/islam#8-islam-ulkeleri-ve-nufus> (08.11.2020).

berhemên edebîyata Zazakî di sedsala XXem de di serdema dewleta Tirkîyeyê de hatine nivîsîn ku di vî wextî de medrese û tekyayên Kurdan ku jêderên sereke yên edebîyata klasîk in azadîya xwe ji dest dane û gelekî lawaz bûne. Yanî edebîyata Zazakî ya klasîk di dewreke wisa de belav bûye ku li cîhana Îslamê edebîyata klasîk nemaye û li nav Kurdan jî jêderên edebîyata klasîk hatine qedexekirin. Edebîyateke ku avabûn û geşedana wê di serdemeke weha de be bi awayekî siruştî dê wek “edebîyateke derengmayî” bê wesifkirin.

Gelo derketin û geşedana edebîyata Zazakî ya derengmayî tê çi wateyê? Ev yek nixê edebîyata Zazakî zêde dike yan kême dike? Gelo di nav dîyalektên edebî yên Kurdî û bi giştî di nav hemû edebîyatên Îslamî de tenê edebîyata Zazakî di vî rewşê de ye, yan edebîyatên di jî hene ku di qonaxa dawîn a tarîxa Îslamê de (di serdema modern de) derketibin meydanê? Bêguman ji bo ku mirov bikare bersiva van pirsan bide divê mirov rewşa giştî ya dîyalektên edebî yên Kurdî û edebîyatên Îslamî bizanibe û cihê edebîyata Zazakî ya klasîk di nav wan de destnîşan bike. Loma jî em dixwazin di çarçoveya tablo û xişteyan de mijarê vekolin û bi vî awayî encameke şênber bi dest bixin.

Ji bo ku em cihê edebîyata Zazakî di nav dîyalektên edebî yên Kurdî de tesbît bikin divê em bi kurtî be jî li seyra tarîxî ya avabûna van dîyalektan binêrin. Çawa tê zanîn dîyalektên edebî yên Kurdî bi giştî li ser pênc beşan tên parvekirin ku ew jî Kurdîya Lorî, Kurdîya Goranî, Kurdîya Kurmancî, Kurdîya Soranî û Kurdîya Zazakî ne. Ji van dîyalektên edebî Kurdîya Lorî di sedsala XIem, Kurdîya Goranî di sedsala XVem, Kurdîya Kurmancî di sedsala XVIem, Kurdîya Soranî di destpêka sedsala XIXem û Kurdîya Zazakî jî di dawîya sedsala XIXem de dest pê kirine<sup>3</sup>.

Ji aliyekî di ve ji bo ku mijar tam zelal bibe divê em li serdemên edebî yên van dîyalektan jî çavekî bigerînin. Bi vî awayî Zazakî jî di nav de kîjan dîyalekt di kîjan serdemê de ava bûye û di kîjan serdeman de li ser pîyan maye dê bê dîtin. Berî her tiştî em dixwazin îfade bikin ku em tarîxa edebîyata Kurdî ya klasîk li ser çar serdemên bingehîn dabeş dikin: Serdema berî mîrektîyan, serdema mîrektîyan, serdema Xalidîtîyê û sedsala XXem. Di tabloya jêrîn de dîyalektên edebî yên Kurdî û serdemên bingehîn ên tarîxa edebîyata Kurdî ya klasîk bi hev re hatine dayîn û hevyeckirin.

<sup>3</sup> Abdurrahman Adak, "Kürtler", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/kurtler#8-dil-ve-edebiyat> (22.12.2020).

Serdem →	Berî Mîrektîyan (X-XIII)	Mîrektî (XIV- 1850)	Xalidîtî (1850- 1925)	Sedsala XXem (1925- 2025)
Dîyalekt ↓				
Lorî	Lorî	Lorî	-	-
Hewramî	-	Hewramî	Hewramî	-
Kurmancî	-	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî
Soranî	-	Soranî	Soranî	Soranî
Zazakî	-	-	Zazakî	Zazakî

**Tablo:** Serdem û Dîyalektên Edebîyata Kurdî ya Klasîk

Di encama hevyeckirina dîyalekt û serdeman de ku di tabloya jorîn de hatine dayîn serdemên dîyalektên edebî yên tarîxa edebîyata Kurdî ya klasîk bi giştî dibin dozdeh heb ku di xîştaya jêrîn de bi awayekî kronolojîk hatine rêzkirin.

1. Edebîyata Lorî ya Serdema Berî Mîrektîyan
2. Edebîyata Lorî ya Serdema Mîrektîyan
3. Edebîyata Hewramî ya Serdema Mîrektîyan
4. Edebîyata Hewramî ya Serdema Xalidîtîyê
5. Edebîyata Kurmancî ya Serdema Mîrektîyan
6. Edebîyata Kurmancî ya Serdema Xalidîtîyê
7. Edebîyata Kurmancî ya Sedsala XXem
8. Edebîyata Soranî ya Serdema Mîrektîyan
9. Edebîyata Soranî ya Serdema Xalidîtîyê
10. Edebîyata Soranî ya Sedsala XXem
11. Edebîyata Zazakî ya Serdema Xalidîtîyê
12. Edebîyata Zazakî ya Sedsala XXem

Tablo û xîştaya jorîn bi awayekî aşkera nîşan didin ku di nav dîyalektên edebî yên Kurdî de edebîyata Zazakî ya klasîk wek edebîyateke derengmayî derdikeve pêş. Lewra avabûna vê dîyalekta edebî di serdema Xalidîtîyê (1850-1925) de û geşedana wê jî di sedsala XXem de ye ku ev her du mawe jî beramberî serdema modern tên. Lêbelê divê neyê jibîrkirin ku temsîlyeta edebîyata Kurdî ya klasîk a serdema modern ne di destê Zazakî tenê de ye. Lewra di serdema Xalidîtîyê de edebîyatên Hewramî, Soranî û Kurmancî û di sedsala XXem de jî edebîyatên Kurmancî û Soranî di vê temsîlyetê de hevrêtiya Zazakî dikan. Di esasê xwe de temsîlyeta edebîyata klasîk ya serdema modern karakterekî giştî yê edebîyata Kurdî ye ku ji

taybetîyên civaka Kurdî neşet dike û dema edebîyata Zazakî di nav vê civakê de ava dibe bi awayekî siruştî vî rengî werdigire.

Niha jî ji bo ku em cihê edebîyata Zazakî di nav hemû edebîyatên Îslamî de tesbît bikin em ê çavekî li van edebîyatan jî bigerînin. Çawa ku di destpêka gotarê de jî amaje pê hatibû kirin hin miletên Misilman di tevahiya tarîxa xwe ya edebî de zimanekî edebî yê standart bi kar anîne, lêbelê hin miletan jî derfeta standardîzekirina ziman bi dest nexistine û di zeman û mekanên cuda de bi dîyalektên xwe yê cuda edebîyatên cuda saz kirine û bi vî awayî edebîyatên dîyalektan derketine meydana. Dema em di çarçoveya standardîzasyon û dîyalektolojîya edebî de li sedsalên avabûna edebîyatên Îslamî dinêrin em dibînin ku edebîyata Erebi di sedsala Vem (Çetin, 2011:55-59), edebîyata Farisî di sedsala IXem (Sefa -bêtarîx:32), edebîyata Kurdîya Lorî<sup>4</sup> di sedsala Xem, edebîyata Tirkîya Hakanî, di sedsala XIem, edebîyatên Tirkîya Osmanî, Harezmî Kıpçakî, Azerî û Çaxatayî (Şentürk û Kartal, 2009:31-195) û Kurdîya Hewramî<sup>5</sup> di sedsala XIVem, edebîyatên Peştû (Andreyev, 2010:92-113), Kurdîya Kurmancî<sup>6</sup>, Urduya Gucri û Urduya Dekkenî<sup>7</sup> di sedsala XVIem, edebîyatên Boşnakî (Aksoy, 2018: 187) û Sewahilî (Ndreitu, 2104:74) di sedsala XVIIem, edebîyata Arnawudî (Jahjai, 2016: 394) di sedsala XVIIIem, edebîyata Kurdîya Soranî<sup>8</sup> di destpêka sedsala XIXem, edebîyata Kurdîya Zazakî<sup>9</sup> di dawîya sedsala XIXem û edebîyata Belûcî di çaryeka duyem a sedsala XXem (1950) (Badalkhan, 2020) de derketine meydana.

Dema em van daneyan ji aliyê standardîzasyon û dîyalektolojîya edebî ve analîz dikin derdikeve meydana ku di edebîyatên Erebi, Farisî, Peştû, Boşnakî, Sewahilî, Belûcî û Arnawudî de zimanekî standart û di edebîyatên Tirkî, Kurdî û Urdu de jî çendîn dîyalekt hatine bikaranîn. Di xîştaya jêrîn de ev edebîyatên Îslamî ji aliyê standardîzasyon û dîyalektolojîya edebî ve hatine dabeşkirin.

Edebîyatên Îslamî	Rewşa Standardîzebûnê	Sedsala Avabûnê
1. Edebîyata Erebi	Erebîya Standart	sedsala Vem
2. Edebîyata Farisî	Farisîya Standart	sedsala IXem
3. Edebîyata Peştû	Peştûya standart	sedsala XVIem
4. Edebîyata Boşnakî	Boşnakîya standart	sedsala XVIIem
5. Edebîyata Sewahilî	Sewahilîya standart	sedsala XVIIem
6. Edebîyata Belûcî	Belûcîya standart	sedsala XXem
7. Edebîyata Arnawud	Arnawudî standart	sedsala XVIIIem

<sup>4</sup> Adak, "Kürtler", TDV İslâm Ansiklopedisi.

<sup>5</sup> Adak, "Kürtler", TDV İslâm Ansiklopedisi.

<sup>6</sup> Adak, "Kürtler", TDV İslâm Ansiklopedisi.

<sup>7</sup> Halil Toker, "Urduca", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/urduca> (12.08.2020).

<sup>8</sup> Adak, "Kürtler", TDV İslâm Ansiklopedisi.

<sup>9</sup> Adak, "Kürtler", TDV İslâm Ansiklopedisi.

8.	Edebîyata Tirkî	Tirkîya Hakanî	sed sala XIem
		Tirkîya Osmanî	sed sala XIVem
		Tirkîya Harezmi	sed sala XIVem
		Tirkîya Kıpçakî	sed sala XIVem
		Tirkîya Azerî	sed sala XIVem
		Tirkîya Çaxatayî	sed sala XIVem
9.	Edebîyata Kurdî	Kurdîya Lorî	sed sala Xem
		Kurdîya Hewramî	sed sala XIVem
		Kurdîya Kurmancî	sed sala XVIem
		Kurdîya Soranî	sed sala XIXem
		Kurdîya Zazakî	sed sala XXem
10.	Edebîyata Urdu	Urduya Gucri	sed sala XVIem
		Urduya Dekkenî	sed sala XVIem

Di xîştaya jêrîn de jî çî edebîyata standart be çî dîyalekta edebî be ev edebîyatên ku li cîhana Îslamê bi awayekî serbixwe derketine meydanê li gor kronolojîya avabûnê hatine rêz kirin.

10

	<b>Edebîyatên Îslamî</b>	<b>Standart/Dîyalekt</b>	<b>Sed sala Avabûnê</b>
1.	Edebîyata Erebi	Erebîya Standart	sed sala Vem
2.	Edebîyata Farisî	Farisîya Standart	sed sala IXem
3.	Edebîyata Lorî	Dîyalekta Lorî ya Kurdî	sed sala Xem
4.	Edebîyata Hakanî	Dîyalekta Hakanî ya Tirkî	sed sala XIem
5.	Edebîyata Osmanî	Dîyalekta Osmanî ya Tirkî	sed sala XIVem
6.	Edebîyata Harezmi	Dîyalekta Harezmi ya Tirkî	sed sala XIVem
7.	Edebîyata Kıpçakî	Dîyalekta Kıpçakî ya Tirkî	sed sala XIVem
8.	Edebîyata Azerî	Dîyalekta Azerî ya Tirkî	sed sala XIVem
9.	Edebîyata Çaxatayî	Dîyalekta Çaxatayî ya Tirkî	sed sala XIVem
10.	Edebîyata Hewramî	Dîyalekta Hewramî ya Kurdî	sed sala XIVem
11.	Edebîyata Kurmancî	Dîyalekta Kurmancî ya Kurdî	sed sala XVIem
12.	Edebîyata Gucri	Dîyalekta Gucri ya Urdu	sed sala XVIem
13.	Edebîyata Dekkenî	Dîyalekta Dekkenî ya Urdu	sed sala XVIem
14.	Edebîyata Peştû	Peştûya standart	sed sala XVIem
15.	Edebîyata Boşnakî	Boşnakîya standart	sed sala XVIIem

- |                        |                           |                        |
|------------------------|---------------------------|------------------------|
| 16. Edebîyata Sewahilî | Sewahiliya standart       | sedsala XVIIem         |
| 17. Edebîyata Arnawudî | Arnawudî standart         | sedsala XVIIIem        |
| 18. Edebîyata Soranî   | Dîyalekta Soranî ya Kurdî | destpêka sedsala XIXem |
| 19. Edebîyata Zazakî   | Dîyalekta Zazakî ya Kurdî | dawîya sedsala XXem    |
| 20. Edebîyata Belûcî   | Belûcîya standart         | sedsala XXem           |

Ev xişte bi me didin nişandan ku ji 20 edebîyatên Îslamî 2 heban di serdema modern a tarîxa Îslamê de avabûna xwe temam kirine ku ew jî edebîyatên Zazakî û Belûcî ne. Loma di nav hemû edebîyatên Îslamî de Zazakî û Belûcî wek du edebîyatên derengmayî derdikevin pêş. Li gor vê edebîyata Zazakî ya klasîk di derengmayîne de ne bi tenê ye û vî wesfî digel edebîyata Belûcî parve dike. Lêbelê ev heye ku di nav her duyan de edebîyata Belûcî ji ya Zazakî jî derengtir e. Lewra edebîyata Zazakî di salên dawî yê sedsala XIXem de lê edebîyata Belûcî di serê nîveka duyem a sedsala XXem de derketîye meydanê. Bêguman ji bo ku edebîyata Zazakî ya klasîk a derengmayî bi awayekî dirust bê analîzkirin û ev edebîyat ji nêz ve bê naskirin divê her du kategoriyên jorîn ên edebîyata Kurdî û edebîyatên Îslamî li ber çavan bên girtin û seyra tarîxî ya edebîyata Zazakî li ser vê bingehe bê avakirin.

## 2. Edebîyata Zazakî ya Klasîk Çima Biwext Derneket Meydanê?

Çawa ku li jorê hat tesbîtkirin edebîyata Zazakî ya klasîk edebîyateke derengmayî ya serdema modern e, ne edebîyateke biwext a serdema klasîk e. Bêguman di biwara sedemên vê yekê de pirsên curbicur tîn bîra mirov ku di nav van de “Gelo edebîyata Zazakî ya klasîk çima di serdema klasîk a edebîyatên Îslamî de bi wext derneketîye meydanê?” wek pîrsa esasî ya mijarê derdikeve pêş. Di dewama vê de jî pirsên bi vî rengî tîn bîro mirov: Gelo digel ku Kurdên Zaza bi Kurdên Kurmanc re heman tarîx û coxrafayê parve dikin û bi heman hadîseyên sîyasî re rûbirû mane çima dema di sedsala XVIem de edebîyata Kurmancî derket meydanê edebîyata Zazakî jî derneket meydanê? Yan gelo di wê serdemê de Kurdên Zaza desthilatdarîyên ku rê li ber edebîyateke Zazakî vekin ava nekirine? Yan gelo ev desthilatdarî hene lêbelê di esnayê sazkirina peymanana Kurd û Osmanîyan de bêteref mane û di encamê de ji destkeftên wê peymanê ku Kurdên Kurmanc bi taybetî di qada edebîyatê de bi dest xistine bêpar mane?

Çavkanîyên tarîxî destnîşan dikin ku di destpêka sedsala XVIem de di şerê Çaldiranê (1514) de dewleta Sefewî ji alîyê hêzên Osmanî û mîrektîyên Kurdan ve tê mexlûbkirin û bi peymannameya ku di sala 1516an de di navbera mîrên Kurdan û Osmanîyan de tê îmzekirin mîrektîyên Kurdan li welatê xwe serxwebûnekê bi dest dixin<sup>10</sup>. Bi taybetî divê bê dupatkirin ku di vê prosesê de di navbera mîrektîyên Kurmancan û yê Zazayan de tu ferq tune ye û hemûyan bi hev re di nav koalîsyona

<sup>10</sup> Ji bo zanyariyên berfireh bnr. M. Emin Zeki, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, (wer.: V. İnce, M. Dağ, R. Adak, Ş. Aslan), Nûbihar, Stenbol 2010, r. 161-171; Lazerîv, *Tarîxu Kurdistan* (wer. Ebdî Hacî), weş. Spîrêz, Hewlêr 2011, r. 80-82; V. Mînskoy, “Kürtler”, *İslam Ansk.*, weş. Milli Eğitim Bakanlığı, İst., 1993, C. VI, r. 1089-1114; Şakir Epözdemir, *İdris-i Bitlisi ve Kürt Meselesi*, weş. Fanos, Ankara 2011.

Kurdan de cih girtine (Aydın, 2000:85-94). Hin ji van mîrektîyan ji alîyê statuya îdarî ve wek hikûmetên Kurdan hatine naskirin ku ji mîrektîyên Kurmancan Cizîr, Hezzo, Tercîl, Bedlîs, Îmadîye ws. û ji yên Zazayan jî Gêl, Palu û Gênc di vê kategoriyê de ne (Kılıç, 2001:262). Şerefxanê Bedlîsî jî di *Şerefnameyê* de çawa ku derheqê mîrektîyên Kurmancan de agahîyan dide, bi heman rengî di bin sernavê “Hin Beg û Hikumdarên dî yên Kurdistanê” de derheqê mîrektîyên Zazayan ê wek Gêl, Palo, Çermûk û Suweydiyan de jî agahîyan dide (Şeref Xan, 2007: 259, 274-286).

Bi awayekî pir balkêş digel ku di tarîxê de ji alîyê statuya sîyasî ve di navbera mîrektîyên Kurmancan û yên Zazayan de hevsengîyeke tam heye jî di navbera edebîyatên wan de hevsengîyeke weha çênebûye. Ji alîyêkî di ve divê bê gotin ku piştî peymanê navborî a ku di destpêka sedsala XVIem de hatibû lidarxistin bi handana Îdrîsê Bedlîsî li nav mîrektîyên Kurdan gelek medreseyan nû ava dibin (Bidlîsî, 2001:239-240)<sup>11</sup> û di van medreseyan de edebîyateke bihêz a Kurmancî derdikeve meydanê (Adak, 2014: r183-342). Di esasê xwe de ev medrese ne tenê li nav mîrektîyên Kurmancan li nav yên Zazayan jî ava bûne. Bo nimûne mîrê Gêlê yê Mirdasî Ce’fer Beg di sala 1607an de li taxa Tekyayê ya Gêla kevin medreseyek ava kirîye ku wek medreseya Ce’ferîye hatîye binavkirin (Beltekin, 2019:410). Lêbelê digel vê jî heta niha berhem yan jî metnekî edebî ku di serdema mîrektîyên Zazayan ên navborî de bi Zazakî hatibe nivîsîn nehatiye tesbîtîkirin.

Gelo digel ku rewşa sîyasî û atmosfera perwerdehîyê li nav mîrektîyên Zaza û Kurmancan bi tevahî wek hev bû, çima di nav mîrektîyên Kurmancan de bi Kurdîya Kurmancî edebîyateke bihêz ava bûye, lê berevajîyê vê di nav mîrektîyên Zazayan de tu metnên edebî nehatine dayîn? Di vê biwarê de *Şerefnameya* Şerefxanê Bedlîsî ku di dewra mîrektîyên Palu û Gêlê de ji alîyê katibê mîrê Paluyê Şem’î ve bo zimanê Osmanî hatîye wergerandin û di sala 1682an de bo mîrê Paluyê Yansûr Beg û di sala 1884an de jî bo mîrê Gêlê Mustafa Beg hatîye pêşkêşîkirin (Baluken, 2016: 20), derîyê hin analîzan ji me re vedike û me digihîne hin encamên girîng. Berî her tiştî ev yek nîşan dide ku di qesrên van mîrektîyan da atmosfereke entellektuel heye lêbelê vê atmosferê edebîyata Zazakî encam nedêraye. Dîsa di qesrên van mîrektîyan de zimanê îdare û rewşenbîrîyê ji Farisî wêdetir Osmanî ye. Di serencamê de di dewra van mîrektîyan de berhem hatine dayîn lêbelê ev berhem ne bi Zazakî, bi Tirkîya Osmanî ne.

Di qesrên Zazayan de hebûna Osmanî û nebûna Zazakî wek paradoksekê bixuye jî, di esasê xwe de ev yek daneyekê girîng e ku dê problema di biwara nebûna berhemên Zazakî de heta astekê çareser jî bike. Ev dane bi awayekî pir aşkera destnîşan dike ku di wê serdemê de di van qesran de zimanê îdare û rewşenbîrîyê Tirkîya Osmanî ye. Bi ihtîmaleke gelekî mezin ev rewş di encama pêwendîyên bihêz ên mîrên Zaza (mîrên Palu û Gêlê) û eyaleta Diyarbekirê ya Osmanî (beylerbeyliği) de derketîye meydanê. Tiştêkî siruştî ye ku di hevdiştin û danûstandinên fermî yên her du alîyan de zimanê Osmanî, ji ber pozîsyona wê ya sîyasî ya serdest, wek zimanê ragihandinê hatibe bikaranîn. Bi ihtîmaleke mezin

<sup>11</sup> Ez spasîyên jidil pêşkêşî Yusuf Baluken dikim ku ev çavkanî bi me re parve kir.

tam jî ji bo bidestxistina vê yekê kesên wek mîr û katibê mîr di medreseyan Osmanîyan de, bi taybetî jî li yên Diyarbekirê ku di wê serdemê de hem navenda eyaletê ye hem jî navendeke pir bihêz a edebîyata Osmanî ye perwerde dîtîbin, di wan medreseyan de fêrî Osmanî bûbin û di qesrên xwe de jî ev zimanê ku pê perwerde dîtine bi kar anîbin. Di encamê de di dewra mîrektiyên Zazayan ên navborî de, li gor daneyên li ber destan, Zazakî nebûye zimanê nivîsînê û bi Zazakî tu berhem nehatine nivîsîn.

Dema em li mîrektiyên Kurmancan dinêrin em dibînin ku di vî warî de li cem wan rewşeke cuda heye. Wan wek zimanê rewşenbîrîyê ne Osmanî, Farisî û Erebi bi kar anîne. Lewra derheqê berhemeke ku di serdema mîrektiyên Kurmancan de bi zimanê Osmanî hatibe nivîsîn di destê me de tu zanyarî tunene. Lêbelê em dizanin ku di serdema wan de bi zimanên Farisî û Erebi berhem hatine nivîsîn<sup>12</sup>. Dema mirov ji vî aliyê ve mîrektiyên Kurmancan û Zazayan dide ber hev derdikeve meydanê ku di navbera wan de ji aliyê zimanê rewşenbîrîyê ve ferqeke bingehîn heye ku ew jî di bikaranîna zimanên xwedî îtîbar ên wê serdemê de xwe dide der. Bi bawerîya me ev yek tiştêkê fêambar e jî. Lewra mîrektiyên Kurmancan ên ku di wê serdemê de bûne navendên edebîyata Kurmancî ku Cizîr, Colemêrg û Amêdîyê di serî de ne û mîrektiyên Zazayan ên navborî (Palu û Gêl) ji aliyê girêdana bi dewleta Osmanî û pêwendîya bi çanda Osmanî re ne di heman rewşê de ne. Mîrektiyên Kurmancan di sînoren dewleta Osmanî yên Îran, Iraq û Rûsyayê de cih digirin û ji navenda dewletê dûr in, lêbelê yên Zazayan li gorî yên Kurmancan nêzîktirî navendê ne. Ji ber vê jî şer û xirecirên siyasî yên ku di navbera Osmanî û mîrektiyên Kurmancan de rû dane (Karademir, 2017: 103-123) di navbera Osmanî û mîrektiyên Zazayan de rû nedane. Ev yek weha jî dikare bê şîrovekirin: Osmanîyan mîrektiyên li navendê bi rehetî kontrol kirine lêbelê yên ji navendê dûr û digihîjin sînoran ewqas bi rehetî kontrol nekirine. Vê jî kiriye ku rengvedana ziman û çanda Osmanî li ser her du kategorîyan bi şeweyên cuda çêbibe û yên li navendê zimanê Osmanî wek zimanê entellektuelîyê bi kar binin lêbelê yên dûr li şûna Osmanî Farisî û Erebi bi kar binin ku wê serdemê ji Osmanî gelekî mutebertir in. Balkêş e ku li nav mîrektiyên Kurmancan li kêleka Farisî û Erebi Kurmancî bûye zimanê edebîyatê lêbelê li nav yên Zazayan li kêleka Osmanî Zazakî derfeteke weha bi dest nexistiye. Aşkera ye ku mîrektiyên Zazayan ji yên Kurmancan zêdetir ketine bin bandora ziman û çanda Osmanî. Bandora ziman û çanda Osmanî a li ser mîrektiyên Zazayan rê nedaye ku edebîyata Zazakî serxwebûna xwe ya edebî bi dest bixe.

Her di çarçoveya şîroveyan jorîn de dikare bê gotin ku di medreseyan aîdê mîrektiyên Zazayan de jî Zazakî wek zimanê perwerdeyê nehatiye bikaranîn. Lewra eger bi Zazakî perwerde hebûya bikaranîna Zazakî wek zimanê nivîsînê

<sup>12</sup> Ji bo hin berhemên ku li nav mîrektiyên Kurmancan bi zimanên Farisî û Erebi hatine nivîsîn bnr. Yakup Aykaç, *Kürt Mirliklerinde Edebi Patronaj*, Teza Doktorayê ya neçapkirî, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Doğu Dilleri ve Edebiyatı Anabilim Dalı Kürt Dili ve Kültürü Bilim Dalı, Diyarbakır 2020, r. 164-165.



edebîyatê jî dê bibûya tişteki siruştî. Kontrola bihêz a dewleta Osmanî ya li ser mîrektîyên Zazayan û pêwendîyên wan ê xurt kiriye ku di medreseyên wan mîrektîyan de zimanê perwerdeyê jî Osmanî be.

Mîrektîyên Zazayan ji aliyê fonksiyona xwe ve dişibin dewlet û desthilatdariyên Kurdan ên nîveka duyem a dewleta Ebbasîyan ku di serdema wan de jî bi taybetî zimanê Erebi rê nedabû ku Kurdî bibe zimanê nivîs û edebîyatê (Adak, 2014:163-164). Çawa ku zimanê perwerde û rewşenbîrîyê li cem dewletên Kurdan 'Erebî ye li cem mîrektîyên Zazayan jî Tirkîya Osmanî ye. Di her du serdeman de jî hin hizr û hestên Kurdîtiyê hene, lêbelê vê yekê têrê nekiriye ku zimanê Kurdî bibe zimanê edebîyatê. Bi rastî jî hizrên Hesenê Peşnewî ku di serdema dewleta Merwanîyan de jîyana xwe bûrandîye û yê Şem'î Efendî ku di serdema mîrektîya Paloyê de jîyana xwe bûrandîye hevterîbê hev in û girîng in. Peşnewî di helbestên xwe yê Erebi de bi pêşîyên xwe yê Kurd şanazî kiriye û piştîgirîya xwe bo dewleta Merwanî destnîşan kirîye (Selefî û Doskî, 2008:15-16). Şem'î jî di destpêka wergera *Şerefnameyê* de ku ji bo mîrê Paloyê ji Farisî bo Osmanî wergerandibû payeyeke bilind daye zimanê Kurdî û xisletên Kurdan ên wek wêrekî û comerdîyê ku ev hizrên wî di pasaja jêrîn de cih digirin:

“.. Melûme we be ku di vî meqamî de mebest ji cihêrengîya zimanan zimanên curbicur ên di nav xelkê de ne ku hin ji wan Erebi, Farisî, Kurdî, Tirkî, Rûmî, Hindî û Efxanî ne. Ji bilî van jî gelek gelek zimanên bîyanî û ecaîb hene ku nayên jimartin. Lêbelê di nav hemû zimanan de yê herî biqîmet û fesîh Erebi ye ku Qur'an bi vî zimanî nazil bûye. Piştî zimanê Farisî tê ku zimanê herî şêrîn ew e. Piştî jî her qewmek zimanê xwe mezin didêre. Heçî Îmam Muhemmed Berqel'î û Mela Muhyeddînê Cizîrî û gelek gelek alimên mezin û fazîlên hêja terciha zimanê Kurdî kirine û ew meqbûl dîtine. Di nav van mîletên Misilman de yê herî zêde wêrek û comerd Erebi in, piştî jî Kurd in” (Şem'î, 2016:50).

Di encamê de van hizrên Şem'î têrê nekiriye ku di serdema mîrektîyên Zazayan ên wek Palo û Gêlê de edebîyateke Zazakî ava bibe. Derketina edebîyateke Zazakî di serdema mîrektîyên Zazayan de wek tişteki asayî, ji wê jî wêdetir wek pêdivîyekê bixuye jî ji ber sedemên ku li jorê hatin îzahkirin de ev yek pêk nehatîye. Sedem çibe ferq nake edebîyata Zazakî ya klasîk bi wext ava nebûye û ji bo avabûna wê divê mirov li hêvîya qonaxa Xalidîtiyê a serdema piştî mîrektîyan bimîne. Bi awayekî balkêş berhema yekem a edebîyata Zazakî ya klasîk piştî ku li derûdora salên 1850yî dawî li van mîrektîyan tê bi 40-50 salî di dawîya sedsala XIXan de di nav rewşeke nû ya sîyasî, civakî û dînî de li gundekî tê dayîn.

### 3. Edebîyata Zazakî ya Klasîk a Derengmayî Çawa Derket Meydanê?

Di beşa jorîn de me destnîşan kir ku herçiqas ji bo avabûna edebîyata Zazakî ya klasîk serdema herî guncaw û bixwet serdema mîrektîyan bû jî di wê serdemê de ev derfet bi dest neketîye û ev edebîyat di serdemeke derengtîr de derketîye meydanê. Îcar di vê beşê de em ê li ser serdema ku edebîyata Zazakî ya klasîk bi derengî be jî derketîye meydanê rawestin û li dor pirsên wek “Edebîyata Zazakî ya klasîk di serdemeke dereng de çawa derket meydanê?” û “Kîjan atmosferê ev edebîyat di vê serdemê de daye destpêkirin?” hin analîzan bikin.

Eger em avabûn û geşedana edebîyata Zazakî ya klasîk di çarçoveya zeman û mekan de bi giştî bi bîr binin; vê edebîyatê bi mewlûda Melayê Xasî ku di sala 1886ê de li Hezana Liceyê hatiye nivîsîn, dîsa bi mewlûda Osman Es'ed Efendîyo Babij ku di sala 1903ê de li Sêwregê hatiye nivîsîn dest pê kiriye, bi berhemên Mihemedê Şêx Ensarî yê bi navên *Me'lûmatê Dînîye* û *Raro Raşt* ku di sala 1947-48an de li devera Hênê hafîne nivîsîn dewam kirîye û di sedsala XXem de bi dayîna çendîn berhemên di li sêgoşeya Dîyarbekir-Xarpêt-Bîngolê hebûna xwe domandîye. Ev jî nîşan dide ku edebîyata Zazakî ya klasîk dawîya sedsala XIXem û tevahîya sedsala XXem dihundurîne ku ev mawe jî beramberî qonaxa dawîn a serdema modern tê.

Ji ber ku di pêvajoya modernîzasyona mîletên Misilman de ji aliyê dewletên Misir, Îran û Osmanî ve çand û sazîyên Rojavayî bi destê van dewletan hatine cîbicîkirin, bi awayekî siruştî vê yekê rengê xwe daye edebîyatê jî û li van dewletan hêdî hêdî terka edebîyata klasîk a Îslamî hatiye kirin û li şûna wê edebîyateke Rojavayî hatiye cîbicîkirin. Destpêkirina vê qonaxê li van dewletan biguhere jî, ji ber ku Kurdên Zaza di bin desthilatdarîya dewleta Osmanî de ne, ji me re ya girîng dewleta Osmanî ye. Çawa tê zanîn di dewleta Osmanî de ji Tenzîmatê şûnde (1960) edebîyata Rojavayî wek edebîyateke xwedî îtîbar ketiye meriyetê û her ku hatiye edebîyata Osmanî ya klasîk qîmetê xwe yê berê wînd kirîye û edebîyata Rojavayî pêş ketîye. Dema edebîyata Zazakî ya klasîk bi destê Xasî û Babij li Hezan û Sêwregê derketîye meydanê rewşa edebîyata Osmanî bi vî rengî ye. Ji aliyekî di ve di wê serdemê de li nav Kurdên Zaza jî mîrektî edî ne li ser pîyan in û bi awayekî siruştî edebîyata Zazakî ya klasîk ji desthilatdarîyeke ku di bin hîmayeya wê de derfeta pêşketinê bi dest bixe mehrûm e.

Di nav van şertan de derketina edebîyata Zazakî ya klasîk wek paradoksekê bixuye jî di esasê xwe de dema mirov ji nêz ve li mijarê dinêre tê dîtîn ku ji bo derketina edebîyata Zazakî ya klasîk hin sedemên di yê rêxweşker hene. Bêguman hilberîna berhemên edebî, bi taybetî jî derketina edebîyateke nû nabe ku jixweber be. Heta şert nekemilin û atmosfereke guncaw saz nebe derketina edebîyatekê jî ne pêkan e. Gelo di vê serdema modern de edebîyata Zazakî ya klasîk çawa dereket meydanê? Şert û mercên ku di serdemeke weha de rê li ber derketina edebîyata Zazakî ya klasîk vekirin çi ne? Bi rastî jî atmosfera edebî ya ku di dawîya sedsala XIXem de edebîyata Zazakî ya klasîk derxistiye meydanê

mijareke gelekî balkêş e. Analîza vê yekê berî her tiştî tê wateya analîza rewşa giştî ya serdema Melayê Xasî û sedemê nivîsîna mewlûda wî. Lewra wek berhema yekem a edebîyata Zazakî ya klasîk tesbîtkirina atmosfera ku bi Xasî berhem daya nivîsîn pir girîng e. Ev yek di heman demê de dê destpêka edebîyata Zazakî bixwe jî ron bike.

Di xatiratên Musa Anter de sedemê nivîsîna mewlûda Xasî bi anekdotekê tê îzahkirin ku ew jî weha ye:

“Çawa tê zanîn Melayê Xasî Kurdê Zaza ye. Ji ber xweşmeşrebîya wî gelek aliman bela xwe lê dane. Rojekê şêxên ji Kurdên Kurmanc weha gotine: “Zaza jî kî ne? Bifikire em Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran deynin aliyekî, di nav we de yekî wek Melayê Bateyî mewlûdekê binivîse jî tuneye. Melayê Xasî jî ev te’rîza ku bi henekî hatiye kirin kiriye behane û gotîye: “Wellahî heta ez mewlûdeke Zazakî nenivîsim ez ji vê malê dernakevim.” û di nav hefteyekê de mewlûda Zazakî ya di dest me de nivîsîye” (Anter, 2010:172).

Şîroveya vê anekdotê bi awayekî sethî weha ye: Kurmancan bi henekî be jî Zaza biçûk dîtine, ji ber vê jî bi Xasî re hestên millî hatine coşê û ev jî bûye sedem ku mewlûda Zazakî derkeve meydana. Rast e ji vê anekdotê encameke weha dikare bê derxistin, lêbelê bêyî ku resmê giştî bê dîtine eger mirov ji nedîtî ve nivîsîna berhemekê bi zimanekî ku berê nebûye zimanê nivîsînê û ji wê zêdetir avabûna edebîyatekê tenê bi anekdotekê ve girê bide dê xwendineke dirust dernekeve holê. Heta mirov atmosfera civakî ya ku qehremanên vê anekdotê tê de mezin bûne, şertên ku temaya vê sohbetê saz kirine li ber çavan negire ev şîrove dê kêmbimîne. Loma ji bo ku mirov bikare sedemên nivîsîna mewlûda Xasî bi dirustî şîrove bike divê mirov li atmosfera giştî ya serdema Xasî binêre.

Di serdema Xasî de herçiqas di encama modernîzasyona dewleta Osmanî de terka edebîyata klasîk hatiye kirin û hamîyên zimanê Zazakî tunene jî, divê neyê jibîrkin ku li nav Kurdan bi taybetî ji aliyê civakî, dînî, tesewifî û perwerdehiyê ve sistemeke xweser û ji ya navenda Osmanî cuda heye ku ev sistem di encama serdestîya bizava Neqşebendîya Xalidî de ava bûye. Ev bizava dînî-tesewifî piştî ku di nîveka sedsala XIXem de di çarçoveya sîyaseta merkezîyetê ya dewleta Osmanî de serdestîya mîrektîyên Kurdan ji holê radibe û hemû mîrektî ji aliyê îdarî ve bi navenda Osmanîyan ve tîr girêdan, li Kurdistanê desthilatdarîya xwe bi dest dixwe ku ev desthilatdarî bi taybetî ji dawîlêhatina mîrektîyan heta bi şerê cihanê yê yekem (1850-1918) gelekî karîger e<sup>13</sup>. Di vê sedemê de tekyayên Xalidîyan û medreseyan bi wan ve girêdayî li seranserê Kurdistanê vedibin û ji aliyê nûnerên Xalidî ve edebîyateke dewlemend a Kurdî ava dibe ku em edebîyata Kurdî ya klasîk a vê sedemê wek “serdema Xalidîyê” bi nav dikin<sup>14</sup>.

<sup>13</sup> Ji bo zanyariyên berfireh bnr. Karademir, b.n. r. 403-433.

<sup>14</sup> Ji bo zanyariyên berfireh bnr. Abdurrahman Adak, “Serdema Xalidîyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”, *Kürt Tarihi*, sal: 2017, j.30, r. 59-64.

Di vê serdemê de devera Liceyê yek ji çend navendên herî girîng a bizava Xalidîtiyê û edebîyata Kurdî ya klasîk e. Bi taybetî avakirina tekyaya û medreseyeke Xalidîyan li Gundê Xasî Hezanê wek şaxeke tekyaya Norşînê hem ji bo belavbûna edebîyata Kurmancî hem jî ji bo avabûna edebîyata Zazakî roleke karîger lîstîye. Şêx Ebdulqadirê Hezanî (k.d. 1905) ku ew bixwe jî di heman demê de nûnerê helbesta Kurmancî ya klasîk e wek xelîfe/nûnerê Şêx Ebdurehmanê Taxî (k.d.1887) tê Hezanê û li wê derê vê tekyaya/medreseya Xalidîyan ava dike. Hûrguliyên pêwendiyên Xasî û Hezanî di çavkanîyan de nehatibin destnîşankirin jî em dizanin ku Xasî di nav sîstema tesewifî ya Xalidîtiyê de xelîfeyekî Hezanî ye<sup>15</sup>. Tiştêkî siruştî ye ku Hezanî wek rêberê tekyaya û medreseyê di helbestvanîya xwe de jî ji Xasî re bûbe jêderê. Li aliyekî di divê behsa Seydayê Licî (k.d.1911) û Şêx Mustefayê Sîsî (k.d.1914) jî bê kirin ku ew jî xelîfeyên Şêx Ebdilqadirê Hezanî yên Liceyê ne û Seydayê Licî di serî de her du jî du helbestvanên Kurmancî nûsên girîng in. Bi rehetî dikare bê gotin ku jêderê di ya helbestvanîya Xasî ev her du helbestvan in ku di xelîfetiya de hembûyê wî ne. Bi kurtî di ciwanîya Xasî de li gund û qezaya wî bizava Xalidîtiyê gelekî bi hêz e, sazîyên perwerdeyê di destê wan de ne û nûnerên Xalidîtiyê yên Hezan û Liceyê di heman demê de nûnerên edebîyata Kurmancî ne jî. Xasî tam di navenda vê atmosfera tesewifî û edebî de cî digire.

Bêguman Xalidîti ne tenê li Hezan û Liceyê li derûdora wê jî karîger e. Bo nimûne em tekyaya/medreseyeke di ya Xalidîyan li Hênê jî dibînin ku ne devereke dûrî Hezanê ye. Çawa ku Şêx Ebdilqadirê Hezanî tê Hezanê û li wê derê tekyaya û medreseyeke Xalidîyan vedike bi heman rengî Şêx Ehmedê Karazî (k.d. 1883) jî tê Hênê û li wê derê tekyaya û medreseyeke Xalidîyan vedike<sup>16</sup> û di encama vê yekê de li Hênê jî hin nûnerên edebîyata Kurdî derdikevin meydanê. Kurê Şêx Ehmedê Karazî Şêx Muhyedînê Hênî (1897?) helbestvanekî edebîyata Kurmancî ya klasîk e û bi mexlesa Sa'î li ser temaya xwarinê menzûmeyeke balkêş nivîsiye<sup>17</sup>. Salih Begê Hênî jî li wê medreseyê pêşî li cem Şêx Me'rûf, piştê jî li cem Şêx Muhyedînê Hênî xwendîye<sup>18</sup> û çawa ku medreseya Hezanî ji Xasî re bûye jêder bi heman rengî medreseya Karazê jî ji Salih Begê Hênî (k.d.1925) re bûye jêder. Helbesta navdar a Salihê Beg (Eger çêkî ji bona dehşê ker ra) mehsûlê vê jêderê ye<sup>19</sup>. Hêjayî gotinê ye ku Sa'î di berhema xwe ya navborî de li dijî Zazayan ji ber hin xisûmetên şexsî hin îfadeyên di asta heqaretê de bi kar tîne (Şengül û Alan, 2015:7) û Xasî jî li dijî wî bi Kurmancî hicwîyeyekê dinivîse (Xasî, 1994:44-

<sup>15</sup>Ji bo jînenîgarîya Hezanî bnr. Şefîk Korkusuz, *Tezkire-i Meşayih-i Amid*, Kent Yay., İst. 2004, r. 62-67; *Arşiv Belgelerinde Son Devir Diyarbakir Uleması*, Melissa Matbaası, İst. 1996, r. 20-21.

<sup>16</sup>Bnr. Hoca Şeyh Maruf, *Diyarbakir İlinin Hani İlçesinde Medfun Şeyh Ahmed Efendinin Tarihçeyi Hayatı*, (wer. Heybet Kanhan), bê cih û tarîx, nusxeya daktîloyê, pirtûkxaneyê A. Adak a taybet.

<sup>17</sup>Ji bo zanyariyên berfireh bnr. Abdurrahman Adak, "Şêx Muhyedînê Hênî Di Edebiyata Kurdî de Nûnerê Girîng ê Temaya Xwarinê". *Nûbihar Akademî*, sal: 1, j. 3, 2015, r. 11-52.

<sup>18</sup>Jêder: Şêx Cahid (Hocaoğlu), hevdiîn, 23.04.2009, Diyarbakir.

<sup>19</sup>Ji bo metnê vê helbestê bnr. Muhammed Siraceddîn Kurê Mela Ebdulhekîmê Xelîfî, *Kitaba Gulcivîn*, nusxeya destnivîs, musehhih û naşir M. Siddîq Ataç, (pirtûkxaneyê taybet a Abdurrahman Adak), tarîx ?, r. 127.

45).<sup>20</sup> Ev jî ji bo ku atmosfera edebî ya serdem û devera ku Xasî lê jîyaye nîşan bide daneyeke girîng e.

Di piraniya erdnîgarîya Zazayên Sunnî/Şafi'î de ku di sêgoşeya Diyarbekir, Xarpêt-Bîngolê de cih digire tekyayên Xalidîyan karîger in. Li gor tesbîtên Ercan Çağlayan li nav Zazayan şêxên herî zêde xwedî î'tibar yên Palu, Pîran, Çan, Melekan, Xelîfan û Saxnisê ne ku hemû jî endamên Xalidîtiyê ne (Çağlayan, 2018: 124). Li vir xala ji bo me girîng ev e ku şêxên li van deveran Zaza bin jî seyda û şêxên wan ên Xalidî Kurmancî in, di medreseyan wan de bi Kurmancî perwerde dîtine û di encama vê de di medreseyan xwe de jî dersên xwe bi Kurmancî dane. Li gor îfadeyan hin melayên Zaza ku Nurettin Beltekin di sala 2014an de derheqê vê mijarê de bi wan re hevdiya li dar xistiye, ev rewş di dewra seydayên wan de guherîye û seydayên wan ên ku bi Kurmancî ders didan terka Kurmancî kirine û dersên xwe êdî bi Zazakî dane (Beltekin, 2014: 76-77) ku ev jî texmînî beramberî 40-50 sal berî niha tê (salên 1970-80yan).

Xala ji bo mijara me girîng ew e ku Kurdên Zaza, çî li deverên xwe çî jî li deverên dî yên Kurmancînişîn, di van medreseyan de bi Kurdîya Kurmancî perwerde dibînin, edebîyata Kurdîya Kurmancî nas dikin û di encama vê yekê de bi zimanê xwe jî dest bi nivîsînê dikin. Temasa Zazayan bi van medreseyan re edebîyata Zazakî ya klasîk derxistiye meydanê. Pir aşkera ye ku Xasî di vê atmosferê de edebîyata Kurmancî nas dike, îlhama xwe jî wê werdigire û hizra nivîsîna bi Zazakî pê re çêdibe. Eger wî di tekyaya û medreseyan Xalidîyan de berhemên edebîyata Kurmancî nas nekiriba û jî atmosfera edebî ya van tekyaya û medreseyan sûd wernegirtiba ne li pey şopa Bateyî mewlûda xwe ya Zazakî dinivîsî, ne li pey şopa Xanî mulemma'a xwe dinivîsî, ne jî bi Kurmancî hicwîye dinivîsî. Ji ber ku di wê serdemê de jî, wek serdema mîrektîyan, Zazakî ne zimanê perwerdeyê ye nivîsîna mewlûda Xasî, yanî derketina edebîyata Zazakî jî ne encama perwerdeya bi Zazakî ye. Di vê serdemê de medreseyan Xalidîyan ne tenê li nav Kurmancan li nav Zazayan jî vebûne, lêbelê ji ber ku Kurmancî wek zimanê perwerdeya medreseyê paşxaneke xwe ya tarîxî heye, li deverên Zazanişîn jî zimanê perwerdeya medreseyan her Kurmancî ye.

Mihemedê Şêx Ensarî (k.d. 1976) jî ku wek Xasî û Babîj di dawîya sedsala XIXem de hatiye dinyayê û piştî Xasî û Babîj nûnerê sêyem ê edebîyata Zazakî ya klasîk e li medreseyan Kurmancan ên devera Botan perwerde dîtîye. Ev yek jî berhemên Ensarî jî dîyar e. Lewra rengvedana edebîyata Kurmancî ya klasîk di berhemên wî de pir aşkera xuya dike. Ji aliyê şêwaz û naverokê ve pêwendîya berhemên Ensarî û *Nehcul'l-Enama* Mela Xelîlê Sêrtî pir aşkera ye (Ensarî, 2018: 85).

Dikare bê gotin ku Osman Es'ed Efendîyo Babîj ne tê de hemû edebîyatvanên Zaza yên klasîk mehsûlê sistema Xalidîtiyê ne û jêdera wan jî edebîyata Kurmancî

---

<sup>20</sup> Mihanî ev hicwîye jî devê Mela Ehmed Sedî nivîsiye. Di vê hicwîyeyê de navê kesê ku Xasî rexneyan lê dike wek Se'îd derbas dibe (ne wek Sa'î). Lê ji uslûba giran a Xasî tê fêmkirin ku ew bersiva heqaretên ku Sa'î li Zazayan kirine dide. Ji ber ku Xasî di hicwîyeyê de gundên Lice û Hênê yên ku vî kesî melatîya wan kirîye dijimêre em dizanin ku Xasî behsa kesekî jî devera Lice û Hênê dike ku ew jî li gor me Sa'î ye.

ye. Heçî Babij e, atmosfera wî ji atmosfera ku li jorê hat îzahkirin cuda ye. Bêguman bizava Xalidîtiyê gihîştîye heta bi Sêwrekê jî û di serdema Babij de li wê derê jî nûnerên Xalidîtiyê hene (Akman, 2017: 283, 306-311). Lêbelê digel vê jî jêdera Babij a helbestvanîyê ji Xalidîtiyê zêdetir edebîyata Osmanî ye. Lewra li gor zanyarîyên li ber destan Babij perwerdeya xwe li cem miftîyê Sêwregê dîtîye. Divê neyê jibîrkirin ku Sêwreg ji alîyê statuya îdarî ya dewleta Osmanî ve sinceq/sancak e û rêvebirên wê jî muteserifên dewleta Osmanî ne (Akman, 2017: 21). Bi awayekî Siruştî li Sêwregê zimanê burokrasîyê û zimanê medreseyên fermî Tirkîya Osmanî ye û vê yekê rengê xwe daye edebîyata wê derê jî. Lewra em dibînin ku Yusuf Samî (k.d. 1931) û Îbrahîm Refet (k.d.1938) du helbestvanên Sêwrekî yên hevçaxê Babij in ku berhemên xwe yên edebî bi zimanê Osmanî dane. Ji van helbestvanan Samî mewlûdek, Refet jî hem mewlûd hem jî dîwanek nivîsîne (Bektaş, 2007: 77, 82). Hêjayî gotinê ye ku Refet di xezeleke xwe ya mulemmê/pirzimanî de cih daye misrayeke Kurmancî û misrayeke Zazakî jî (Bektaş, 2012: 103-104). Divê mirov atmosfera ku Xasî, Ensarî û yên dîtir teneffus kirine ji ya Babij cuda bike. Tiştêkî pir siruştî ye ku Babij bi her du mewlûdnûsên Osmanî yên navborî re di nav pêwendîyê de be û di navbera wan de danûstandineke edebî hebe û mewlûda Babij di nav vê atmosferê de hatibe nivîsîn.

Di vê çarçoveyê de di tarîxa edebîyata Zazakî ya klasîk de mirov dikare behsa du jêderan bike. Yek ji van edebîyata Kurmancî, ya dî jî edebiyata Osmanî ye. Paralelî vê yekê edebîyata Zazakî ya klasîk li ser du hewzeyan dikare bê dabeşkirin: Edebîyata Zazakî ya klasîk a ku di bin tesîra Kurmancên Xalidî de maye û ya ku di bin tesîra Osmanîyan de maye. Koma yekem li deverên wek Palu, Pîran, Hênê, Licê, Gênc, Bîngol û Xinisê belav bûye û ya duyem jî bi taybetî li Sêwregê ye. Di koma yekem de perwerde di medreseyên Xalidîyên Şafi'î de ye û edebîyata serdest jî Kurmancî ye. Lêbelê di ya duyem de bajarê Sêwregê bi mektebên fermî edebîyata serdest a dewleta Osmanî temsil dike. Ji van her du koman bandora Kurmancan li ser edebîyata Zazakî ya klasîk ji ya Osmanî gelekî zêdetir e. Edebîyata Zazakî ya klasîk bi giştî di bin tesîra jêdera yekem de belav bûye. Nûnerên edebîyata Zazakî ya klasîk ên sedsala XXem bi giştî di vê komê de ne. Lêbelê di koma duyem de bi taybetî Osman Es'ed Efendîyo Babij cih digire.

Wek encam di serdema Xalidîtiyê de geşedana perwerdeya medreseyê li nav Zazayan û bi rêya vê yekê naskirina edebîyata Kurmancî bi xwe re rewşenbîriyek anîye û di encama vê yekê de edebîyata Zazakî ya klasîk derketîye meydanê. Çawa ku di beşa pêwendîdar de hatibû gotin, di serdema mîrektîyan de bi îhtîmaleke mezin Zazayan bi Tirkîya Osmanî perwerde dîtine. Li gor vê dikare bê gotin ku di serdema mîrektîyan de perwerdeya bi zimanê Tirkî rê li ber derketina edebîyateke Zazakî girtîye, lêbelê berevajîyê vê di serdema Xalidîtiyê de perwerdeya bi Kurdî (Kurmancî) edebîyata Zazakî ava kirîye.

#### **4. Tarîxa Edebîyata Zazakî ya Klasîk: Serdem û Mehsûlên Edebî**

Çawa ku hat gotin edebîyata Zazakî ya klasîk di dawîya sedsala XIXem de bi mewlûda Melayê Xasî dest pê kiriye (1886) û ji wê demê ve heta bi roja me hebûna xwe berdewam kiriye ku ev mawe dike 124 sal. Bêguman ev mawe ji bo edebîyatekê, herçiqas derengmayî be jî, ne maweyeke kurt e û wek hemû edebîyatan pêwîst e seyra tarîxî ya vê edebîyatê jî bê tesbîtkirin ku ev yek jî dikeve qada tarîxa edebîyatê. Çawa tê zanîn dema kesayet, metn û ekolên edebîyatekê bi awayekî kronolojîk di çarçoveya rewşên sîyasî, civakî, dînî û hwd. de bîn pêşkêşkirin tarîxa edebîyatê derdikeve meydanê. Loma jî di tarîxa edebîyatê de kategorîzekirina kesayet, metn û ekolên edebî û di encamê de dabeşkirina tarîxa edebîyatê li ser serdeman bûye rêbazeke bingeîn a zanistî ku di edebîyatên cihanê de tê şopandin. Herçiqas tarîxeke pir kevin a edebîyata Zazakî ya klasîk tunebe jî wek tarîxên hemû edebîyatan senifandina tarîxa edebîyata Zazakî ya klasîk jî pêdivîyek ye.

Bi perspektîfeke berfireh a tarîxa sîyasî û civakî ya Kurdên Zaza û di çarçoveya jînenîgarîya edebîyatvanên Zaza û atmosfera wan edebî de tarîxa edebîyata Zazakî ya klasîk li ser du qonaxên sereke dikare bê dabeşkirin: Edebîyatvanên ku di serdema Xalidîtiyê û dawîya Osmanîyan de hatine dinyayê û perwerdeya xwe di wê serdemê de dîtine û yên ku piştî damezirandina Komara Tirkîyeyê hatine dinyayê û perwerdeya xwe di wê serdemê de dîtine. Ji ber ku qonaxa yekem di heman demê de qonaxa damezirandin û destpêka edebîyata Zazakî ya klasîk e em wê wek “qonaxa destpêkê” bi nav bikin dê guncaw be. Dîsa ji ber ku edebîyata Zazakî ya klasîk esas piştî vê qonaxê belav dibe em qonaxa piştî damezirandinê ku rastî serdema dewleta Tirkîyeyê tê wek “qonaxa geşedanê” dikarin bi nav dikin. Li vê derê divê bê ronkirin ku roleke erênî ya dewleta Tirkîyeyê di vê geşedanê de tune ye. Berevajiyê wê eger astengî û qedexeyên dewletê tunebûna edebîyata Zazakî ya klasîk a vê serdemê dê derfeta belavbûneke zêdetir bi dest bixista.

Qonaxa geşedanê jî di nav xwe de li gor rewşên sîyasî yên Tirkîyeyê li ser çar qonaxan dikare bê dabeşkirin. Qonaxa yekem “qonaxa qedexeyê” ye. Dema em li seyra tarîxî ya dayîna berhemên dinêrin em dibînin ku berhemên Mihemedê Şêx Ensarî ne tê de ji destpêka dewleta Tirkîyeyê heta bi salên 1975an bi Zazakî tu berhemên edebîyata klasîk nehatine dayîn. Çawa tê zanîn bi qanûna esasî ya sala 1924an hebûna Kurdan hatîye înkarkirin, zimanê Kurdî hatîye qedexekirin û medreseyên Kurdan jî bi qanûna “Tewhidê Tedrîsatê” hatine girtin<sup>21</sup>. Piştî bûyera Şêx Se’îdê Pîran jî ku di sala 1925an de qewimîye serkutîya dewletê ya li ser Kurdan zêdetir bûye ku Kurdên Zaza ji ber pêwendîya deverên wan bi bûyera Şêx Se’îd re rasterast tûşî vê serkutiyê hatine û vê yekê jî bi awayekî nerênî rengê xwe daye edebîyata Zazakî ya klasîk.

Di qonaxa duyem de ku beramberî perîyoda 1975-1980yî tê, em dibînin ku piştî qonaxa destpêkê bi demeke dirêj komek berhemên edebî hatine dayîn. Di vê

<sup>21</sup> [http://www.meb.gov.tr/belirligunler/10kasim/inkilaplari/egitim/tevhid\\_tedrisat.htm](http://www.meb.gov.tr/belirligunler/10kasim/inkilaplari/egitim/tevhid_tedrisat.htm) (24.12.2020).

qonaxê de jî qedexeya li ser ziman û çanda Kurdî heye, lêbelê dikare bê gotin ku li gor qonaxa berî xwe û ya piştî xwe li welatê Kurdistan rehetîyeke nisbî jî heye ku helbestvanan ji vê rehetîyê sûd wergirtine û hin behemên edebî jî dane. Piştî vê qonaxê kudetaya leşkerî ya 1980êyî çêbûye û ji vê salê heta bi sala 1991ê dîsa rewşeke dijwar a qedexeyê dest pê kirîye. Loma di vê qonaxê de jî bi Zazakî tu berhem nehata dayîn. Di sala 1991ê de bi guherîna makezagona Tirkîyeyê rê li ber weşana bi ziman û lehçeyên mehelli vebûye û di encama vê yekê de di xebatên ziman û edebîyata Kurdî de azadî û geşepêdanekê dest pê kirîye. Em dibînin ku vê yekê bi awayekî erênî rengê xwe daye edebîyata Zazakî ya klasîk jî û di vê qonaxê de komê berhemên edebî hatine dayîn.

Li jêrê ev serdemên tarîxa edebîyata Zazakî ya klasîk û helbestvanên ku di van serdeman de cih digirin<sup>22</sup> hatine pêşkêşkirin. Di listeya helbestvanan de zanyariyên li ser deverên helbestvanan, jidayîkbûn û eger wefat kiribin wefata wan, berhemên wan û tarîxa nivîsîna berhemên jî hatine dayîn. Bi vî awayî hem taybetîyên serdeman hem jî zanyariyên derheqê helbestvan û berhemên wan ên edebî de bi hev re dê bîna şopandin.

#### 4.1. Serdema Xalidîtiyê/Dawîya Osmanîyan: (Qonaxa Destpêkê) (1896-1948)

Ji ber ku helbestvanên vê serdemê di serdema Xalidîtiyê û dawîya Osmanîyan de hatine dinyayê, perwerdeya xwe di vê serdemê de dîtine û qismekî mezin ji jîyana xwe di vê serdemê de bûrandine ev serdem dibe “Serdema Xalidîtiyê/Dawîya Osmanîyan”. Di vî wextî de bi taybetî li nav Zazayên Sunnî-Şafî’î serdestîya Xalidîtiyê heye. Melayê Xasî endamekî terîqeta Xalidîtiyê ye û pêwendîya wî bi tekya û medreseyan wan re heye. Ensarî jî bi heman rengî di medreseyan wan de xwendîye. Heçî Babij e ew li Sêwregê di nav çanda Osmanî-Henefîyan de ye. Her sê helbestvan bi hevparî dibin helbestvanên dawîya Osmanîyan.

Di çarçoveya zanyariyên berdest de helbestvanên vê qonaxê digel zanyariyên pêdivî li jêrê hatine dayîn:

Mela Ehmedê Xasî (Hezan/Licê, 1867-1951)	: Mewlûd (1896)
Osman Esad Efendî (Bab/Sêwreg, 1852-1929)	: Mewlûd (1903)
Şêx Mehemedê Şêx Ensarî (1879-1976)	: Raro Raşt (1948) û Me’lûmatê Dînîye (1948)

Ji aliyekî dî ve ji ber ku berhemên pêşî yên edebîyata Zazakî ya klasîk di vê serdemê de hatine dayîn ev serdem dibe qonaxa destpêkê ya tarîxa edebîyata

<sup>22</sup> Ji bo zanyariyên helbestvanan ji van jêderan sûd hatîye wergirtin: Ahmet Kırkan, *Bîyîşa Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û Destpêkê Edebîyatê Klasîk yê Kırmanckî*, Weşanxaneya Vateyî, İst. 2018, r. 35-47; Hasip Bingöl, “Zaza Şiir Tarihi Üzerine Bir İnceleme”, *Sözden Yazıya Zazaca*, (edt. N. Beltekin/A. Kırkan), Peywend, Stenbol 2019, r. 148-159.



Zazakî. Ev serdem bi mewlûda Xasî dest pê dike (1896-1948) û bi her du berhemên Ensarî bi dawî tê. Loma temenê vê serdemê teqribî dibe 50 sal.

#### **4.2. Komara Tirkîyeyê/Sedsala XXem (Qonaxa Geşedanê)**

Ji ber ku helbestvanên vê serdemê di wexta dewleta Tirkîyeyê û sedsala XXem de jîyana xwe bûrandine û perwerde dîtine ev serdem dibe serdema Komara Tirkîyeyê/Sedsala XXem. Ev serdem di nav xwe de li gor rewşa sîyasî ya dewleta Tirkîyeyê li ser çar qonaxan dikare bê dabeşkirin. Ev qonax di heman demê de qonaxa geşedanê ye. Lêbelê divê bê gotin ku ev geşedaneke siruştî ye û bandora erênî ya dewleta Tirkîyeyê li ser vê geşedanê tune. Berevajîyê wê eger ne ji ber atmosfera nerênî ya vê serdemê bûya geşedana vê edebîyata Zazakî dê gelekî zêdetir bibûya. Lêbelê ji ber ku li gor serdema destpêkê di vê serdemê de jimara nivîskar û berheman zêdetir e ev serdem dibe serdema geşedanê.

##### **4.2.1. Qonaxa Qedexeyê (1924-1969)**

Çawa ku hat gotin di avakirina dewleta Tirkîyeyê de zimanê Kurdî û medreseyên Kurdan tîr qedexekirin. Ji ber vê jî ev qonax dibe qonaxa qedexeyê. Ev qonax ji avakirina dewletê dest pê dike (1924) û heta bi sala 1969an dewam dike. Eger em Ensarî nehesibînin ku ew aîdê serdema berê ye û di çarçoveya zanyarîyên berdest de di vê qonaxê de tu berhem nehatine nivîsîn. Di vê qonaxê de rewşa giştî gelekî dijwar e. Bûyera Şêx Se'îd ku zêdetir di nav Zazayan de qewimîye bi taybetî tesîreke nerênî li ser Zazayan kirîye û di encamê de îmkana nivîsîna berhemên Zazakî çêbûye.

##### **4.2.2. Qonaxa Rehetîya Nisbî (1969-1982)**

Di vê qonaxê de rehetîyeke nisbî heye. Wisa xuyaye ku hin gavên demokratîk ku ji alîyê dewletê ve hatine avêtin bûne sebebê vê rehetîyê û rengvêdana vê li ser edebîyata Zazakî ya klasîk jî çêbûye. Piştî qonaxa destpêkê cara duyem di vê qonaxê de berhem hatine dayîn. Çawa ku di beşa pêwendîdar de hat gotin di salên salên 70-80yan de di medreseyên Zazayan de zimanê perwerdeyê guherîye û li şûna Kurmancî êdî bi Zazakî ders hatine dayîn. Bi bawerîya me ev yek jî bûye sedemê girîng a geşedana vê qonaxê. Loma ev serdem ji bo tarîxa edebîyata Zazakî ya klasîk girîng e. Mixabin vê serdemê tenê 13 salan dom kirîye.

Di çarçoveya zanyarîyên berdest de helbestvanên ku di vê qonaxê de berhem dane digel zanyarîyên pêdivî li jêrê hatine dayîn:

Mela Mehemed Elî Hunî (Hun/Palu, 1930-): Qesîdeyê Se'îdê Nûrsî (1969), Weqayê Kerbela Hezretî Hesenî û Hezretî Huseynî (1970), Eqîdey Îman-Eqîdey Îslam (1970), Mewlûdo Zazakî (1971), Mi'rac û Wefatî Nebî (1971), Hikmet û Edebîyat (1971), Heketey Yûsuf û Zelîxa (1982), Xezay Uhudî (?) Qesîdeyî (1975)

Mela Mehmedê Nêribî (Nêribê Axan/Hênê, 1936-): Qesîdeya Şeştî Ferzî (1975)

Mela Mihemed (Demirtaş) (1936)<sup>23</sup> : Diwan (1977)

Mehmet Mehdi Özsoy (1944-2009) : Dîwan 2014, Mem û Zîn 1976

Mela Muhemmedê Hezanî (Hezan/Licê, 1939-) : Eqîdetu'l-Îmanî (1982)

#### 4.2.3. Qonaxa Qedexeyê (1982-1995)

Ev qonax bi kûdetaya 1980yî dest pê dike û heta bi avêtina gavên demokratîk ên sala 1991ê dewam dike. Di vê qonaxê de qedexeyê dijwar dest pê dike û rengvedana vê yekê bi awayekî nerênî li ser edebîyata Zazakî ya klasîk çêdibe. Loma bi qasî ku tê dîtin di vê serdemê de tu berhem nehatine dayîn.

#### 4.2.4. Qonaxa Serbestîyê (1995- )

Ev qonax ji sala 1991ê dest pê dike û heta bi roja me dewam dike. Di sala 1991ê de bi guherîna makezagona Tirkîyeyê rê li ber weşana bi ziman û lehçeyên mehellî vebûye û di encama vê yekê de di xebatên ziman û edebîyata Kurdî de azadî û geşepêdanekê dest pê kirîye. Em dibînin ku vê yekê bi awayekî erênî rengê xwe daye edebîyata Zazakî ya klasîk jî û di vê qonaxê de komek berhemên edebî hatine dayîn. Lêbelê divê bê gotin ku helbestvanên vê qonaxê bi awayekî homojên ne mehsûlê medreseyê ne. Helbestvanên vê qonaxê jî alîyê terzê perwerdeyê ve li ser du koman dikarin bîn dabeşkirin: Yên ku perwerdeya wan a esasî medrese ne û yên ku perwerdeya wan a esasî mektebên fermî ne.

Di çarçoveya zanyariyên berdest de helbestvanên vê qonaxê digel zanyariyên pêdivî li jêrê hatine rêzkirin:

Ebdulqadir Muşekî (Muşek/Çewlîg, 1968- )	: Mewlûd (1995)
Mela Kamîlê Puexî (Puex/Çewlîg, 1938- )	: Mewlûd (1999)
Mela Mehmedê Muradan (Muradan/D. Hênê, 1952- )	: Mewlûd (2000)
W. K. Merdimîn (Çewlîg, 1954- )	: Dîwan (2004), Dîwano Nêmcet (2015)
Ali Sizer (Fexalade/Qulp- )	: <i>Seruvên-i Mehşeri</i> (2007)
Mila Cimayo Babij (Sêwreg, 1946- )	: Sîyer (2009)
Bîlal Feqî Çolîg (Çewlîg, 1971- )	: Mewlûd (2012), Dubeytîyên Baba Tahir-wer., Dîwana Îmam Şafî'î-wer., Qur'ana Kerîm-wer.
Mela Muhemmedê Kavari (Şatos, D. Hênê, 1941- )	: Dîwan
Mela Aziz Beki (Çewlîg, 1945- )	: Dîwon Cebexçurî (2015)

23 Ji bo zanyariyên berfireh bnr. Hatip Erdoğmuş, Molla Mehmet Demirtaş ve Melayê Cızîrî'de Naat, Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, b. 2 j.1 sal: 2014, r. 187-195.

## 5. Edebîyata Zazakî ya Klasîk û Klasîzma Edebî

Herçiqas dawîya sedsala XIXem û tevahîya sedsala XXem ji bo Edebîyata Zazakî ya klasîk salên damezirîn û geşedanê bin jî di esasê xwe de ev mawe ji aliyê dayîna berhemên bihêz û orjînal ve nebûye maweyeke bibereket. Di vê maweyê de bi geşedana medreseyên Xalidîyan li deverên Zazanişin û di encama perwerdeya di van medreseyan de û bi modelwergirtina edebîyata Kurmancî ya klasîk bi Kurdîya Zazakî qederek mehsûlên edebî hatibin dayîn jî ev yek bi tena serê xwe edebîyateke bihêz û dewlemend ava nake. Çawa ku li jorê di bin sernavê “Edebîyata Zazakî ya klasîk di Serdemeke Dereng de Çawa Derket Meydanê?” de jî hatibû îzahkirin; di serdema damezirinadina edebîyata Zazakî ya klasîk de, li dewletên Îslamê yên wê serdemê, bi awayekî giştî, şert û mercên ku edebîyata klasîk derdixin meydanê ji holê rabûne û li şûna edebîyata klasîk a Îslamî edebîyata Rojavayê hatîye îqamekirin. Di vê serdemê de desthilatdarîyên ku edebîyateke Zazakî xwedî bikin û hîmayeya edîban bikin jixwe tunene. Lewra dema edebîyata Zazakî ya klasîk ava bûye ji ser dawîlêhatina mîrektîyan re teqribî 50 sal derbas bûne. Herweha di wê serdemê de ji mîrektîyên Zazayan perwerdeyeke bi zimanê Zazakî wek mîras nehatîye wergirtin û sazîyên medreseyê yên ku di wan de bi zimanê Zazakî perwerde tê dayîn jî tunene.

Piştî vê qonaxê li Tirkîyeyê jî qedexekirina medrese û tekkeyên ku di tarîxê de jêderên eslî yên edebîyata klasîk bûn bandoreke gelekî xirab li ser seyra edebîyata Zazakî yên klasîk kir. Eger em her du berhemên destpêka edebîyata Zazakî hesab nekin edebîyata Zazakî di serdemeke weha de di nav şertên dijwar de hêdî hêdî meşîyaye. Herçiqas piraniya berhemên Zazakî di vê serdemê de hatibin dayîn jî, di esasê xwe de rengvedana vê serdemê li ser edebîyata Zazakî ne rengvedaneke erênî ye. Guman tune ku eger qedexe tunebin û şert gunçaw bin sedsalek ji bo edebîyatekê maweyeke dirêj e. Di encamê de serdemên ku edebîyata Zazakî ya klasîk di wan de ava bûye û pêş ketîye bi awayekî nerênî rengê xwe daye estetîka vê edebîyatê ku di vê beşê de em ê li ser vê mijarê rawestin.

Çawa tê zanîn edebîyat şaxek ji hunerên bedew e ku amûra wê peyv e. Eger peyv bi şêwazeke estetîk ku bandorê li ser ruhê guhdar û xwîneran bike ji bo derbirîna hest, hizir û xeyalên mirovan bê bikaranîn li wê derê hunera edebîyatê derdikeve meydanê. Di edebîyatên cihanê de têgihîştina hunera edebîyatê û pratîzekirinên wê ji hev cihê ne û di çarçoveya van cudahiyan de bizavên edebî yên cuda jî derktine meydanê. Lêbelê ev heye ku çî li Rojava be çî li Rojhilatê be ferq nake di klasîzmê de edebîyat hunereke bilind û pêşketî ye ku bi xwe re tradîsyoneke edebî jî saz kirîye. Di vê têgihîştinê de zimanê edebî çiqas ji zimanê rojane dûr bikeve û wateyên mecazî hilgire, çiqas li ser xeyalê ava bibe, metnê edebî ji aliyê bihîzariyê û dîtbarî ve çiqas bandoreke zêde li ser guhdar û xwîneran bike asta hunerî ya wî metnî ewqasî bilind dibe. Ev yek di heman demê de lîrîzmê jî îfade dike ku metnên lîrîk wek metnên herî pêşketî ên hunerî derdikevin pêş. Hem di edebîyata Rojava hem jî di ya Rojhilatê de ji cureyên edebî bi taybetî helbest ji aliyê temsîla hunera edebîyatê ve cihê xwe yê pir girîng heye. Bi taybetî di edebîyata Îslamî de cihê helbestê pir cuda ye. Lewra di vê edebîyatê yekane cureya edebî helbest e ku hem

hunera pêşketî hem jî lîrîzmê bi hev re temsîl dike. Di edebîyatên Îslamî de tradîsyoneke bihêz a edebîyatê ava bûye ku bîngeha wê di edebîyatên Erebi û Farisî de hatîye avêtin û piştê jî di edebîyatên di yê Îslamî de hatîye şopandin. Bêguman di tradîsyona edebî ya Îslamî de gelek rêzik û standart ava bûne ku li vê derê pêşkêşkirina hûrgulîyan ne pêkan e<sup>24</sup>. Di vê beşê de em dixwazin di çarçoveya qonaxên edebîyata Zazakî ya klasîk de li gor pîvanên klasîzma edebî ya Îslamî û tradîsyona edebîyata klasîk nirxandinekê li ser edebîyata Zazakî ya klasîk bikin. Di encamê de em dixwazin fêhm bikin ku alîyên nerênî yê serdemê jî alîyê “edebîbûn”ê yan jî hunera edebîyata Îslamî ve bandoreke çawa li edebîyata Zazakî ya klasîk kirîye.

Berî her tiştî divê bê gotin ku di edebîyata Zazakî ya klasîk de metnên edebî (dîwan, mesnewî û menzûmeyên curbicur) yê kevin ku di serdema desthilatdarîya mîrektîyên Zazayan de hatine nivîsîn tunene. Ji ber vê jî ne di serdema Xalidîtiyê de ne jî di sedsala XXem de di vê edebîyatê de tradîsyoneke edebî ya domdar ku paşxana wê metnên edebî yê kevin in ava nebûye.

Di dawîya sedsala XIXem de (serdema Xalidîtiyê/dawîya Osmanîyan) jî destpêka damezirandina edebîyata Zazakî ya klasîk ne bi hêz e. Di nav berhemên damezirîner ên edebîyata Zazakî ya klasîk de dîwan yan jî dîwançeyan cih negirtine. Hêjayî gotinê ye ku helbesta Xasî ya ku bi forma muxemmesê û hunera telmî’ê/pirzimanîyê (muxemmesa mulemma ku di her pênc misrayên bendan de, bi rêzê zimanên Erebi, Farisî, Tirkî, Kurmancî û Zazakî bi kar anîne) hatîye nivîsîn (Xasî, 1985:35), helbesta wî ya ku wek hicwîyeyekê li dijî Şêx Muhyedînê Hênî (Sa’î) hatîye nivîsîn (Xasî, 1994:44-45) û ferdeke wî ya ku ji du misrayan pêk tê û di dawîya mewlûda wî de cih digire (Xasî, 2013:54), herweha helbesta Mihemedê Şêx Ensarî ku wek medhîyeyekê di pesnê Melayê Cizîrî de hatîye nivîsîn nimûneyên pir xweş û orjînal ên klasîzmê ne. Lêbelê vê keliyê tenê ev helbest hene û herçiqas ihtîmala hebûna helbestên wan ên di hebe jî nayê zanîn ka gelo Xasî û Ensarî bi qasî ku dîwan yan dîwançeyek derkeve meydanê helbest nivîsîne yan na. Di encama nebûna dîwan û dîwançeyan de formên helbesta klasîk ên curbicur ên wek xezel, murebbe’, muxemmes, terbî’, texmîs, terkîb, tercî’, rubaî û ws. di edebîyata Zazakî ya klasîk a qonaxa destpêkê de nehatine bikaranîn. Dîsa di encama nebûna dîwan û dîwançeyan de qalibên cihê ên kêşa erûzê ku rîtm û mûsîqîya helbestê bi melodîyên cihê saz dikin nehatine bikaranîn. Bêguman dema dîwanên ku di wan de komek helbest tîn berhevkerin tunebin cihêrengî û dewlemendiya form û mûsîqîya helbestê jî dê dernekeve meydanê.

Çawa ku di nav berhemên damezirîner ên edebîyata Zazakî ya klasîk de dîwan/dîwançe nehatine nivîsîn mesnewîyên tehkîyeyî ku ji vegêrana bûyeran pêk tîn jî nehatine nivîsîn. Bo nimûne mesnewîyeke wek Leyla û Mecnûnê ku di piranîya edebîyatên klasîk ên Îslamî de hatine nivîsîn di qonaxa destpêkê ya

<sup>24</sup> Ji bo zanyariyên berfireh bnr. Adak Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, Nûbihar, Îst., 2019, r. 27-56.

edebîyata Zazakî de tune. Di esasê xwe de ji ber ku mewlûd ji aliyê formê ve û heta dereceyê ji aliyê şêwaza vegêranê ve bi mesnewiyên tehkîyeyî re taybetiyên hevbeş hildigirin, ji aliyê Xasî û Babij ve ji dîwanê zêdetir nivîsîna mesnewîyeke tehkîyeyî tiştêkî asayî bû. Digel her tiştî di edebiyata Zazakî ya klasîk de teşeya mesnewiyê xwedî cihekî girîng e. Lewra berhemên bingehîn ên vê edebiyatê bi teşeya mesnewiyê hatine nivîsîn. Hem mewlûdên Melayê Xasî û Osman Efendî Babij hem jî *Raro Raşt* û *Me'lûmatê Dîniye* yên Mihemedê Şêx Ensarî ku berhemên destpêkê ên edebiyata nivîskî ya Zazakî ya klasîk in, mesnewî ne. Di sedsala XXem de jî bi teşeya mesnewiyê çend mewlûdname û mesnewiyên dîdaktîk ên di warê zanistên Îslamî de (eqîdename, fiqihname, siyer) di edebiyata Zazakî ya klasîk de hatine nivîsîn.

Helbesta lîrik ku cureya herî bihêz a edebîyata Îslamî ye di qonaxa destpêkê ya edebîyata Zazakî ya klasîk de pêş neketiye. Ev yek jî di esasê xwe de bi nebûna dîwan û dîwançeyan ve girêdayî ye. Dîsa bi vê ve girêdayî cureyên edebî yên bi siruştê re têkildar (behariye û hwd.) û yên bi kesan re têkildar (mersiye û hwd.) ku cureyên berbelav ên edebîyata klasîk in derneketine meydanê. Her çar berhemên qonaxa destpêkê di kategoriya cureyên dînî de cih digirin. Ji van berheman her duyên Mihemedê Şêx Ensarî berhemên dîdaktîk in ku ji aliyê hunerî zêdetir aliyê wan ê pedagojîk li pêş e. Mewlûdên Xasî û Babij jî cureyên dînî yên lîrik in ku aliyê wan ên edebî ji berhemên Ensarî gelekî zêdetir e.

Di sedsala XXem de (qonaxa geşedanê ya edebîyata Zazakî ya klasîk) de em dibînin ku di hejmara berheman de zêdebûnek çêdibe. Di nav berhemên vê serdemê de jî cureyên edebî yên dînî di serî de ne. Lêbelê di vê serdemê de hin dîwan hatine nivîsîn û dikare bê gotin ku nebûna dîwanan a di qonaxa destpêkê de hatîye telafîkirin. Lêbelê divê bê gotin ku ev dîwan ji aliyê teknîka klasîk a rêzkirina helbestan (tertîba dîwanê), bikaranîna formên cuda û cureyên edebî ve lawaz in. Loma divê bê gotin ku berhemên ku di vê qonaxê de navê dîwanê li wan hatîye kirin bi wateya berhemên ku helbestên helbestvanekî kom dikin dîwan in. Dîsa berevajiyê qonaxa destpêkê di vê qonaxê de hin berhemên tehkîyeyî (Mela Mehemed Elî Hunî, *Heketey Yûsuf û Zelîxa*, *Xezay Uhudî*; Mehmet Mehdi Özsoy, *Mem û Zîn*) jî tînin ku ev yek jî wek xaleke erênî ya vê qonaxê derdikeve pêş.

Di vê qonaxê de jî wek qonaxa destpêkê di çarçoveya cureyên edebî yên dînî de bi cureya mewlûdê û zanistên Îslamî berhem hatine nivîsîn. Lêbelê divê bê gotin ku herçiqas mewlûd û menzûmeyên zanistên Îslamî yên vê qonaxê ji yên qonaxa destpêkê zêdetir bin jî, ji aliyê asta edebî ve ji wan kêmtir in. Bi taybetî di hin mewlûdan de tradîsyona edebîyata klasîk a mewlûdnûsiyê qet nehatîye şopandin. Ev mewlûd ji aliyê wezna standart a mewlûdan ve ku ev wezn ji aliyê Xasî ve bi awayekî serkeftî hatibû bikaranîn derî standarta tradîsyona edebîyata klasîk in. Mewlûdnûsên vê serdemê îlhama xwe ji mewlûdên Xasî û Babij zêde wernegirtine. Ev jî nîşan dide ku di edebîyata Zazakî ya klasîk a vê serdemê de qet nebe di cureya mewlûdê de tradîsyoneke edebî ku ji Xasî hatibe wergirtin ava nebûye. Li aliyekî di di van mewlûdan de terkkirina wezna erûzê, yan jî nivîsîna bi kêşa jimareyî divê wek dûrketineke bingehîn ji tradîsyona mewlûdnûsiya

edebîyata klasîk bê nîrxandin. Hin ji van berheman wek pexşana menzûm ku tenê bi serwayê ji pexşanê vediqetin dikarin bîn qebûlkin.

Li vê derê divê bi taybetî li ser cudahiya di navbera asta edebî ya berhemên qonaxa destpêkê û qonaxa geşedanê bal bê kişandin. Pir aşkera ye ku edebîyatvanên qonaxa destpêkê bi taybetî jî Xasî û Mihemedê Şêx Ensarî ji aliyê serwextbûna bi zanista edebîyatê û qabilîyeta şexsî ve ji yên qonaxa geşedanê gelekî pêşketitir in. Bi gotineke dî edebîyatvanên qonaxa sedsala XXem di serwextîya bi zanista edebîyata klasîk de lawaz in. Di esasê xwe de ev tiştêkî asayî ye û heman tişt di edebîyatvanên Kurmanc ên serdema me de jî tê çavdêrîkirin. Dema em li tarîxa edebîyata Kurmancî dinêrin pir aşkera ye ku di medreseyan serdema mîrektîyan û yên serdema Xalidîtîyê de girîngî bi zanista edebîyatê hatiye dayîn, lêbelê di sedsala XXem de bi tesîra qedexekirina medreseyan û hin hizrên ku dijayetîya edebîyatê dikin di medreseyan de tenê li ser zanistên zimanzanîya erebî hatiye rawestan û vê yekê jî kiriye ku zanista edebîyatê lawaz bibe. Mixabin di roja me de ev rewş zêdetir tê çavdêrîkirin. Ji ber ku çanda medreseyê di nav Kurdên Kurmanc û yên Zaza de hevpar e heman tişt ji bo edebîyata Zazakî jî derbas dibe.

Bi vî awayî tê dîtin ku edebîyata Zazakî ya klasîk ji pîranîya taybetî, rêzik û standartên klasîzma Îslamî bêpar maye. Bêguman mewlûda Xasî ku berhema yekem a Zazakî ye di çarçoveya edebîyata Zazakî de di nîrxê klasîkekê de ye, lêbelê eger bê gotin ku di vê edebîyatê de ji aliyê pîvanên klasîzma edebî ve berhemêke tam û birêkûpêk (dîwaneke helbestan yan jî mesnewîyeke tehkîyeyî) nehatiye nivîsîn dê ne şaş be. Pir aşkera ye ku derketina edebîyata Zazakî ya klasîk a di serdemeke dereng de bi awayekî nerênî rengê xwe daye huner û estetîka edebîyata Zazakî ya klasîk. Bêguman ev encama nerênî ya derengmayîne tiştêkî asayî ye ku nimûneyên wê di qadên dî de jî tînin. Bo nimûne akademîsyenê Yewnanî Jusdanîs modernîzasyona derengmayî ya Yewnanîstanê wek modernîzasyoneke tam neserkeftî li qelem dide ku ev yek encama nerênî ya derengmayîne ye (Jusdanis, 2018). Loma eger bê gotin ku her derengmayînek bedelê xwe heye, edebîyata Zazakî ya klasîk jî ev bedel bi lawazîyê daye dê ne darazeke şaş be.

### Encam

Di serdema modern a tarîxa Îslamê de mîletên Misilman ên wek Erebi, Îranî û Tirkên di çarçoveya sîyaseta dewletên xwe de kultura Rojavayê wergirtin û di encama vê yekê de wek gelek sazîyên dî di sazîya edebîyatê de jî guherînek çêbû. Di vê serdemê de li nav Erebi, Îranî û Tirkên edebîyata klasîk a Îslamî cihê xwe da edebîyata modern a Rojavayî. Lêbelê ji ber ku ev modernîzasyona ku bi destê dewletan çêdibû negihîştibû nav Kurdan li Kurdistanê ji aliyê edebî ve rewşeke cuda heye. Ev serdem ji bo Kurdên Kurmanc, Soran û Goran bûye serdema bizaveke nû ya edebî ku ew jî Xalidîtî ye û ji bo Kurdên Zaza jî bûye serdema damezirandina edebîyata Zazakî ya klasîk. Ji ber ku edebîyata Zazakî ya klasîk bi

wext derneketîye meydanê û di serdemeke ku li cîhana Îslamî terka edebîyata klasîk hatiye kirin de derketîye meydanê dibe edebîyateke derengmayî.

Di serdema mîrektîyên Zazayan de edebîyateke Zazakî ku di encama patronajeke edebî de derketibe meydanê nayê zanîn. Herweha tradîsyoneke perwerdeya bi zimanê Zazakî ku ji serdema mîrektîyan dest pê kiribe û di serdema piştî mîrektîyan de dewam kiribe û di encama vê yekê de mîraseke edebîyatê ku ji berê hatîbe wergirtin û wek tradîsyon hatibe şopandin tune. Loma jî jêdera sereke ya edebîyata Zazakî ya klasîk edebîyata Kurmancî ya klasîk e ku di medreseyên Kurmancan de hatîye naskirin. Kurmancan bi saya paşxan û tecrubeya medreseyên serdema mîrektîyan di serdema piştî mîrektîyan de jî sazîyên xwe yên medreseyê li ser pîyan hiştin û tevna medreseyên xwe gihandin heta bi sahaya Dîyarbekir, Elezîz, Bedlîs, Çewlig û Mûşê ku Kurmanc jî û Zaza jî li wan deran dijîn. Hemû daneyên li ber destan nîşan didin ku Kurdên Zaza bi rêya van medreseyan û medreseyên li deverên di edebîyata Kurmancî nasnekiriban îro me nedikarî behsa edebîyata Zazakî ya klasîk bikin. Loma edebîyata Zazakî ya klasîk esas di encama pêwendîyên navdîyalektî de derketîye meydanê ku ev tiştekî gelekî asayî ye. Dema em li tarîxa edebîyata Kurdî dinêrin em dibînin ku di nav hemû dîyalektên Kudî yên cîran û tîkel de tîkîlîyên bi vî rengî çêbûne ku tîkîlîyên Lorî-Hewramî, Hewramî-Soranî, Soranî-Kurmancî û ya Kurmancî-Zazakî di vî çarçoveyê de ne. Bi taybetî divê bê gotin ku pêwendîyên Kurmancî û Zazakî pir dişibin yên Hewramî û Soranî. Lewra edebîyata Soranî ya klasîk jî berî detspêkirina edebîyata Zazakî ya klasîk tenê bi niv qernî qet tunebû û li wê coxrafyayê serdestîya edebîyata Hewramî hebû. Çawa ku Kurdên Zaza bi rêya naskirina edebîyata Kurmancî edebîyata xwe ava kirin, Kurdên Soran jî bi rêya naskirina edebîyata Hewramî edebîyata xwe ava kirin. Lêbelê ferq ew bû ku di serdema derketina edebîyata Soranî de mîrnişîniyên Kurdên Soran hê jî li ser pîyan bûn, lêbelê di serdema derketina edebîyata Zazakî ya klasîk de dewra mîrnişîyan qedîyabû. Ji ber ku edebîyata Soranî di serdema mîrektîyan de derket meydanê di demeke kurt de gelekî pêş ket, lêbelê ji ber ku Zazakî piştî mîrektîyan de derket meydanê zêde pêş neket.

Di encamê de ji aliyê huner û estetîka edebîyatê û klasîzma edebî ve edebîyateke bihêz derneket meydanê. Lêbelê edebîyata Zazakî ya klasîk çiqas paşwext be û çiqas lawaz be jî ew di encamê de ketîya qada hebûnê. Bi derengî be jî bi destê Xasî û Babîj qet nebe aliyekî tradîsyona edebiyata klasîk a Rojhilata Îslamî ketîye nav kirasê Zazakî jî. Bi berhemên van her du kesayetên ku di wextê xwe de derfeta çapkirinê jî dîtine Zazakî bûye zimanê nivîs û edebîyatê. Di heman demê de ev helwesteke rewşenbîrîyê ye ku di encama wê de zimanekî wesfê hebûnê hilgirtîye. Aşkera ye ku ev kesayet bi hemû rêzîk û regezên edebiyatên Erebi, Farisî, Osmanî û Kurmancî tam serwext bûn û eger bixwestana dikarîbûn zewqên xwe yên estetîk bi wan zimanan îfade bikin û bi gelek destkeftan jî sîdemend bibin. Lêbelê wan hizra ziman û mîletê xwe kirine û edebîyateke nû damezirandine ku ev ji bo mîletê wan bûye ronesansek û “bîyîşek”. Bi saya wan edebîyata Zazakî ya klasîk bûye

edebîyateke 124 salî (li gor sala nivîsîna mewlûda Xasî ku berhema yekem a vê edebîyatê ye) û edebîyateke tam a xwedî şax (edebîyatên klasîk, modern û gel).

Bi bawerîya me divê derketina qada hebûnê û lawazîya asta edebî neyê tevlîhevkerin. Edebîyata Zazakî ya klasîk kêmasîyên xwe hebin jî ew di encamê de şaxek ji edebîyatên Kurdî û Îslamî ye. Edebîyata Zazakî ya klasîk çawa ku yek ji pênc dîyalektên edebî yên Kurdî ye di heman demê de yek ji 20 edebîyatên Îslamî ye ku di çarçoveya vê xebatê de hatine tesbîtkirin. Divê bê gotin ku di nav edebîyatên Îslamî de edebîyata derengmayî ne tenê Zazakî ye. Edebîyata Belûcî jî di serdema modernîzmê de derketîye meydanê û avabûna wê ji ya Zazakî jî derengtir e. Edebîyata Zazakî ya klasîk di nav edebîyatên klasîk ên Îslamî de di dereceya sêyem de cih digire. Di dereceya yekem de yên damezirîner (Erebî û Farisî) di dereceya duyem de yên kevin û ji aliyê mehsûlên edebî ve dewlemend (Osmanî, Kurmancî û yên dî) di dereceya sêyem de jî yên bi derengî derketine meydanê û ji aliyê mehsûlên edebî ve lawaz cih digirin (Zazakî û Belûcî). Edebîyata Zazakî ya klasîk ji bo edebiyata Îslamî dewlemendîyek, ji bo edebîyata Kurdî hêzek û ji bo edebîyata Zazakî jî bîyîşek e.

Edebîyata Zazakî ya klasîk bi saya civaka kurdan a tradîsyonel di sedsala XXem de geşedanek bi dest xist. Pir aşkera ye ku bi modernîzebûna civakê re êdî edebîyatvanên ku xwe bi klasîzma Îslamî re sînor dikin dê dernekevin. Di çarçoveya edebîyata Zazakî ya klasîk de hin berhem bèn dayîn jî ew dê negihîjin asta “helbesta lîrîk a klasîk”. Ji vir şûnde li şûna ku mirov ji bo telafîkirina kêmasîyên edebîyata Zazakî ya klasîk bikeve nav hewldanan, mirov edebîyateke Zazakî ya modern, bi taybetî jî helbesteke modern ku klasîzma edebîyata Zazakî ya klasîk, dîyalektên edebî yên Kurdî û edebîyatên dî yên Îslamî jî jêdereke wê bin bixe rojevê dê zêdetir li xêra edebîyata Zazakî ya îroyîn û edebîyata Kurdî ya giştî be.

### Çavkanî

- Adak, A. (2012). “Liceli Şairlere Genel Bir Bakış”, *Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri*, 05-06 Eylül 2008, (amd.) Ahmet Erkol-Abdurrahman Adak, Mardin: Mardin Üniversitesi Yayınları.
- Adak, A. (2014). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, İstanbul: Nûbihar.
- Adak, A. (2015). “Şêx Muhyedînê Hênî Di Edebiyata Kurdî de Nûnerekî Girîng ê Temaya Xwarinê”. *Nûbihar Akademî*, 1(3), 11-52.
- Adak, A. (2017). “Serdema Xalidîtîyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”, *Kürt Tarihi*, 30, 59-64.
- Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, İstanbul: Nûbihar.
- Adak, A. "Kürtler", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/kurtler#8-dil-ve-edebiyat> (22.12.2020).



- Akman E. (2017). *19. Yüzyılın İkinci Yarısında Siverek (Şehir, Mekân ve İnsan)*, Teza Doktorayê ya neçapkirî, Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı, Mardin.
- Aksoy, Ö. (2018) "Türk Kültürü Etkisinde Teşekkül Eden Bir Edebi Gelenek: Boşnak Alhamiyado Edebiyatı", *TÜRÜK Uluslararası Dil, Edebiyat ve Halkbilimi Araştırmaları Dergisi*, sal 6, j.14.
- Andreyev, S. (2010), "Pashto Literature: The Classical Period", A History of Persian Literature: XVIII (General Editor—Ehsan Yarshater), London-New York: I.B. Tauris, 92-113.
- Anter, M. (2010). *Hatıralarım*, İstanbul: Med Yay.
- Aydın, N. (2000). *Diyarbakır-Eğil Hükümdarları Tarihi*, İstanbul: Keskesor.
- Aykaç, Y. (2020). *Kürt Mirlüklerinde Edebi Patronaj*, Teza Doktorayê ya neçapkirî, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Doğu Dilleri ve Edebiyatı Anabilim Dalı Kürt Dili ve Kültürü Bilim Dalı, Diyarbakır.
- Badalkhan, S. (2020), Jahani, Carina, A Brief Introduction to Balochi Literature. <http://baask.com/archive/a-brief-introduction-to-balochi-literature/> (16.08.2020).
- Baluken, Y. (2016). "Sunuş", Şem'î Terceme-i Tevarîh-i Şeref Han, amd. Adnan Oktay, İstanbul: Nûbihar.
- Bektaş, E. (2012). Siverekli İbrahim Re'fet Dîvânı, Ankara: Şanlıurfa Valiliği.
- Bektaş, E. (2007). "Siverekli İbrahim Re'fet ve Mevlidi", Selçuk Ün. Fen-Edb. Fak. Edb. Dergisi, j. 17 (r. 77-103).
- Beltekin, N. (2014). "Vera Modernbiyayişî de Medreseyê Rojhelatî / Şerqî" Nûbihar Akademî, sal. 1, j. 1, 76-77.
- Beltekin, N. (2014). "İslam Eğitim ve Bilim Tarihinin Kayıt Dışı Kurumları: Mir Medreseleri". *Atlas II. Uluslararası Sosyal Bilimler Kongre Tam Metin Kitabı*, Edîtor: Gökhan Ofluoğlu, Atabek Movlyanov, İksad Yayınevi.
- Bidlîsî, İ. (2001). *Selim Şah-name* (amd. Hicabi Kırılangoç), Ankara: Kültür Bakanlığı Yay.
- Bingöl, H. (2019). "Zaza Şiir Tarihi Üzerine Bir İnceleme", *Sözden Yazıya Zazaca*, (edt. N. Beltekin/A. Kırkan), Stenbol: Peywend.
- Çağlayan, E. (2018). *Zazalar Tarih Kültür ve Kimlik*, İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Çolîg, F. (2014). *Tefsîrê Qurônê Kerîm Zazakî*, İstanbul: Astun Yayınları.
- Çetin, N. M. (2011). *Eski Arap Şiiri*, 2. b, İstanbul: Kapı Yay.
- Dursun, D. "İslâm (Günümüz İslam Dünyası)", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/islam#8-islam-ulkeleri-ve-nufus> (08.11.2020).
- Ensarî, M.Ş. (2018). *Raro Raşt & Me'lumatê Dîniye*, amd. Bilal Zilan, İstanbul: Nûbihar.
- Epözdemir, Ş. (2011). *İdris-i Bitlisi ve Kürt Meselesi*, Ankara: Fanos.
- Erdoğan, H. (2014). "Molla Mehmet Demirtaş ve Melayê Cızîrî'de Naat", *Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 2, 1, 187-195.

- Gökalp, Z. (1992). *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler* (amd. Şevket Beysanoğlu), İstanbul.
- Jusdanis, G. (2018). *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür-Milli Edebiyatın İcat Edilişi*, (wer. Tuncay Birkan), İstanbul: Metis Yayınları.
- Karademir, N. (2017). *Osmanlı'nın Son Yüzylında Kürtler: Modernleşme, Merkezîyetçilik ve İsyân*, İstanbul: Nûbihar.
- Kırkan, A. (2018). *Bîyîşa Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û Destpêkê Edebîyatê Klasîk yê Kirmanckî*, İstanbul: Weşanxaneya Vateyî.
- Kılıç, O. (2001). "Ocaklık Sancakların Osmanlı Hukukunda ve İdarî Tatbikattaki Yeri", *Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 11, 1, 257-274.
- Korkusuz, Ş. (2004). *Tezkire-i Meşayih-i Amid*, İstanbul: Kent Yay.
- Korkusuz, Ş. (1996). *Arşiv Belgelerinde Son Devir Diyarbekir Uleması*, İstanbul: Melissa Matbaası.
- Lazerîv, M. S. (2011). *Tarîxu Kurdistan*, wer. Ebdî Hacî, Hewlêr: Spîrêz.
- Maruf, H. Ş. (bê tarîx). *Diyarbakır İlinin Hani İlçesinde Medfun Şeyh Ahmed Efendinin Tarihçeyi Hayatı*, wer. Heybet Kanhan) bê cih, nusxeya daktîloyê, pirtûkxaneya A. Adak a taybet.
- Minorsky, V. (1993). "Kürtler", *İslam Ansklopedisi*, İstanbul Millî Eğitim Bakanlığı.
- Sefa, Z. (bêtarîx). *İran Edebiyatı Tarihi*, wer. Hasan Almaz, bê cih: Nûsha, (b. I).
- Selefî, H. E. & Doskî, T. Î. (2008). *Mu'cemu 'ş-Şu'eraî 'l-Kurd*, Erbîl: Spîrêz.
- Şem'î, (2016). *Terceme-i Tevarîh-i Şeref Han*, amd. Adnan Oktay, İstanbul: Nûbihar.
- Şentürk, A. A. & Kartal, A. (2009). *Eski Türk Edebiyatı Tarihi*, İstanbul: Dergah Yay.
- Şeref Xan. (2007). *Şerefname Dîroka Kurdistanê*, ji Soranî bo Kurmancî Ziya Avci, İstanbul.
- Şengül, S.& Alan, R. (2015). "Pêşkêşî", *Şêx Muhyedîne Hênî Beyana Xwarinan û Zewqên Wan*, amd. Mela Birhanê Tarînî, Stenbol: Peywend.
- Toker, H., "Urduca", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/urduca> (12.08.2020).
- Xasî, M. E. (1994). *Mewlûde Nebî Bi Zîwanê Kurdî (Zazakî)*, tadox Mihanî, İstanbul: Fırat Yay.
- Xasî, S. (1985). *Mewlûd*, amd. Zeynelabidin Amidi, Diyarbekir.
- Nderitu, A. (2014). *Swahili Literature & The Case For Kiswahili as Africa's Lingua Franca, Changing Kenya's Literary Landscape Past, Present & Future*, Nairobi/Kenya, <http://www.alexandernderitu.com> (16.08.2020).
- Jahjai, M. (2016) "Osmanlı Yazısı ile Yazılan Arnavut Edebiyatının Dini Karakteri", *Avrasya Etüdüleri* 50/2016-2, 389-404.
- Zeki, M. E. (2010). *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, wer.: V. İnce, M. Dağ, R. Adak, Ş. Aslan, Stenbol: Nûbihar.

*Edebîyata Zazakî ya Klasîk:  
Di Peywenda Dîyalektên Edebîyên Kurdî û Edebîyatên Îslamî de  
Edebîyateke Klasîk ya Derengmayî û Cihê Wê di Nav Klasîzma Edebî de*

**Çavkanîya Destnivîs:**

Xelîlî, Muhemmed Sîraceddîn Kurê Mela Ebdulhekîmê, *Kîtaba Gulcivîn*, nusxeya destnivîs, musehhih û naşir M. Siddîq Ataç, tarîx ?, (pirtûkxaneya taybet a Abdurrahman Adak).

**Çavkanîya Elektronîk:**

[http://www.meb.gov.tr/belirligunler/10kasim/inkilaplari/egitim/tevhidi\\_tedrisat.htm](http://www.meb.gov.tr/belirligunler/10kasim/inkilaplari/egitim/tevhidi_tedrisat.htm) (24.12.2020).

**Hevdîtin:**

Şêx Cahid (Hocaoğlu), hevdîtin, 23.04.2009, Diyarbekir.

## TÜRKİYE’DE KIRMANCCA (ZAZACA) ÜZERİNE YAZILAN YÜKSEK LİSANS TEZLERİNİN BİBLİYOMETRİK ANALİZİ (2013-2020)

MUTLU CAN<sup>1</sup>

### ÖZ

Bibliyometrik araştırma; belirli bir alanda belirli bir dönemde ve belirli bir bölgede kişiler ya da kurumlar tarafından üretilmiş belge, tez ve yayınların tür, dil, yıl, konu, metot gibi özellikler bakımından incelenerek birbirleriyle olan ilişkilerinin sayısal olarak analiz edilmesidir. Bu çalışmada, Yükseköğretim Kurumu Ulusal Tez Merkezi (YÖKTEZ) veri tabanında 2013-2020 (2020 için süre 21 Eylül olup yaklaşık 8 yıl) yılları arasında Kirmancca (Zazaca) konulu yayımlanan 49 adet yüksek lisans tezi bibliyometrik özellikleri açısından analiz edilmiştir. Çalışmanın amacı Türkiye’de Kirmancca (Zazaca) üzerine yazılan 49 tezin detaylı analizini yaparak bibliyometrik bir profil oluşturmaktır. Çalışmada, istatistiksel işlemlerin analizi için SPSS 25.0 (statistical package for the social sciences) programından yararlanılmıştır. Yapılan incelemeler sonucunda, en fazla tezin 2015 ve 2017 yıllarında yayımlandığı belirlenmiştir. Bu çalışma Kirmancca (Zazaca) ile ilgili çalışmalar yapacak araştırmacılara hem ön bilgi vermesi hem de bibliyometrik bir çalışma olması açısından önem taşımaktadır.

**Anahtar Kelimeler:** Kirmancca, Zazaca, Zazaca yüksek lisans tezleri, Kürt Dili ve Kültürü yüksek lisans tezleri, bibliyometri

### Analîze Tezanê Masterî yê Tirkîya ke Kirmanckî (Zazakî) ser o Nusîyayê (2013-2020)

### KILMNUŞ

Cigêrayîşo bibliyometrik belge, tez û weşanê ke yew war yan termînêkê diyarkerdeyî yan zî mintîqayêka diyarkerdeye de hetê kesan yan zî dezgehan ra amade biyê, hetê taybetîyanê înan yê sey bêj, zıwan, serre, metod, ûsn. ra tehlîlkerdişê înan û bi hewayê hûmarkî analizkerdişê yewbînan reyde têkilîyanê înan ifade kenê. Na xebate de 49 tezê masterî ke databasê Merkezê Tezan yê Neteweyî yê Dezgehê Perwerdeyê Berzî (YÖKTEZ) de mabênê serranê 2013 û 2020î de (seba 2020î mudet hetanî 21ê êlule yo; teqrîben 8 serrî) weşanîyayê û mabênê eynî demî de kirmanckî ser o nusîyayê, hetê taybetîyanê înan yê bibliyometrikan ra ameyî analizkerdene. Amancê xebate no yo: 49 tezê ke Tirkîya de nusîyayê û babeta înan

<sup>1</sup> Kürt Dili ve Kültürü Yüksek Lisans Mezunu, Kürt Dili (Zazaca) Uzmanı, [canmutlu1978@gmail.com](mailto:canmutlu1978@gmail.com)  
<https://orcid.org/0000-0001-6121-2849>

**Article Type/Makale Türü:** Research Article / Araştırma Makalesi

**Received / Makale Geliş Tarihi:** 10.10.2020

**Accepted / Makale Kabul Tarihi:** 28.10.2020

**Doi:** 10.35859/jms.2020.808681

kirmanckî ya, bidetay bêrin analizkerdene û bi no hewa yew profilo bîbliyometrik pêardene yo. Xebate de, semedê analizkerdişê kirarîyanê statistîkan programê SPSS 25.0î (statistical package for the social sciences) ra ame îstîfadekerdene. Peynîya analizanê ke ameyî kerdene de, tesbît bî ke tewr zêde tezi serranê 2015 û 2017î de ameyê weşanayene. Seba ke na xebate hem zanayîşanê prelîmînalana dana cigêrayoxanê ke ê do kirmanckî ser o xebatan bikerê, hem zî xebatêka bîbliyometrik a, ehemîyetê aye esto.

**Kiltîçekuyî:** Kirmanckî, zazakî, tezê masterî yê zazakî, tezê masterî yê ziwan û kulturê kurdan, bîbliyometri

## **Bibliometric Analysis of Master Thesis Writen on Kirmancki (Zazaki) in Turkey**

### **ABSTRACT**

Bibliometric research is the investigation of documents, theses and publications, produced by individuals or institutions in a specific field, period and region in terms of the characteristics such as genre, language, year, subject, method and is the quantitative analysis of their relationship to each other. In this study, 49 master theses written on the subject of Kirmancki (Zazaki) in Turkey published by the Council of Higher Education National Thesis Center (YÖKTEZ) database between 2013- 2020 (about 8 years) are analyzed in detail in terms of their bibliometric features. The aim of the study is to create a bibliometric profile through the analysis of these 49 theses written in Kirmancki (Zazaki) in Turkey. In the study, SPSS 25.0 (statistical package for the social sciences) program was used for the analysis of statistical processes. As a result of the analyses, it was identified that most of the theses were published in the years between 2015 and 2017. This study is important for the researchers who will conduct studies about Kirmancki (Zazaki) in terms of both providing preliminary information and guiding them to these fields of study.

**Keywords:** Kirmancki, Zazaki, Master Thesis in Zazaki, Master Thesis in Kurdish Language and Culture, Bibliometrics.

### **Giriş**

Kürdoloji sözcüğü genel olarak Kürt dili, tarihi, edebiyatı, toplumsal yapısı hakkında yapılan yazılı çalışmalar, incelemeler anlamına gelir. Aynı sözcük, bu konularda çalışma yapan bilimsel kurumlar anlamına da gelir (Bruinessen, 2009: 171). Kürdoloji ile ilgili ilk bölüm Çarlık Rusya’sında Büyük Katerina’nın himayesinde Bilimler Akademisi üyesi Simon Pallas önderliğinde bütün dillerin karşılaştırmalı sözlüğünün hazırlanmasıyla kurulmuş oldu. (Alakom, 1991: 96) Bu çok dilli sözlüğün içerisinde 276 Kürtçe sözcük de bulunduğu için Kürt dili sahasında yayımlanan ilk eser olduğu söylenebilir (Nikitin, 1976: 202). Kürtlerin sosyo-kültürel yapısını daha iyi anlamak adına ilk resmi girişim 1860’da St. Petersburg’da kurulan “Kürdoloji Enstitüsü” ile olmuştur. Bu enstitü ile Kürtlerle ilgili ilk araştırma kurumu Rusya tarafından resmi olarak açılmıştır (Nikitin, 1976: 202).

Dünya ölçeğinde baktığımızda iki yüz yıldan fazla geçmişi bulunan akademik nitelikli Kürt dili, edebiyatı ve kültürü konulu bilgi üretiminin Türkiye’deki varlığı ise henüz çok yenidir. 2009 tarihli Bakanlar Kurulu kararıyla Mardin Artuklu Üniversitesi bünyesinde kurulan Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü bu alanda atılan ilk adımdır. Bu enstitü bünyesinde 2010 yılında kurulan Kürt Dili ve

Kültürü Anabilim Dalı Türkiye'deki ilk resmi ve akademik nitelikli Kürdoloji faaliyetlerine ev sahipliği yapmıştır. Bölümün amaçları arasında Kürt dili ve diyalektlerinin (Kurmancî, Zazakî, Sorani, Lorî, Goranî) edebiyatları, tarihleri ve kültürlerinin disiplinler arası tarzda araştırılarak tanıtılması, eğitim-öğretim ve araştırma faaliyetlerinde bulunmak ve öğrencilerinin bilimsel araştırmacı özelliklerini kazanmasına yardımcı olmak vardır.<sup>2</sup> Mardin Artuklu Üniversitesi dışında Kırmancca (Zazaca) alanında da yüksek lisans eğitimi verilen ikinci bilimsel kurum ise 2011 yılında kurulan Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü'dür. Bugüne kadar Türkiye'de yazılmış tüm Kırmancca konulu yüksek lisans tezleri bu iki enstitünün bünyesinde hazırlanmıştır.

Bir alanda yapılmış yayınların çeşitli yöntemlerle analiz edilmesine ve bilimsel amaçlı çalışmaların değerlendirilmesine olanak sağlayan belge incelemesine dayalı çalışmalar bibliyometrik araştırmalar olarak ifade edilmektedir (Coşkun ve diğ., 2014: 381; aktaran Beşel ve Yardımcıoğlu, 2017: 134). Bibliyometrik yöntemler bilimsel çalışmaların analiz edilerek içerik, sonuç ve etkinliklerinin belirlenmesini sağlamaktadır. Bilimsel çalışmaların bibliyometrik analizi genelde söz konusu alandaki tezlerin veya seçilmiş bir derginin analizi ile gerçekleştirilmektedir (Beşel ve Yardımcıoğlu, 2017: 134-135).

Kürtçe (Kurmancca-Kırmancca) literatüre bakıldığında yüksek lisans tezlerini bu bağlamda değerlendiren çok az sayıda araştırmacıya rastlanmaktadır. Gerek bu bakımdan gerekse de salt Kırmancca lehçesi odaklı yapıldığı göz önünde tutulduğunda bu çalışmanın araştırmacı ve akademisyenlere yol gösterecek nitelikte önemli bilgiler sunacağı düşünülmektedir. Zira bu araştırma ile Kırmancca alanında yapılan çalışmalara bir bütünlük içerisinde bakılarak gelecek araştırmacılara alan ile ilgili ışık tutulacak ve gelecekte hazırlayacakları tezlerde tekrara düşmemeleri, orijinal ve yaratıcı bilgi üretimi yapabilmelerine katkı sağlanacaktır.

## 1. Kuram ve Literatür

Bibliyometri, akademik yayınların değişik öğelerinin sayısal analizler ve istatistikler aracılığıyla incelenmesi, kitaplar ve diğer iletişim platformlarına uygulanması olarak ifade edilmektedir (Pritchard 1969; Zan, 2012). Bibliyometrik araştırmalarda akademik yayınların belirli unsurları analiz edilerek bilimsel iletişime ilişkin çeşitli bulgulara ulaşılmaktadır. (Al ve Coştur, 2007; Al ve diğ., 2010). Bibliyometri, bilim uzmanları, bilimsel araştırma ve araştırma projesi yürütenler, kütüphaneciler, yöneticiler ve karar vericiler tarafından sıklıkla başvurulan bir araştırma tekniğidir (Özel ve Kozak, 2012).

<sup>2</sup> Bkz. <https://www.artuklu.edu.tr/yasayan-diller-enstitusu/anabilim-dallari/k%C3%BCrt-dili-ve-k%C3%BCrt-%C3%BCr-%C3%BC> (erişim tarihi: 11.09.2020)

Bibliyometri terimi ilk kez Aralık 1969 yılında, Alan Pritchard’ın *Journal of Documentation* dergisinde yayımlanan “İstatiksel bibliyografya mı yoksa bibliyometri mi?” isimli çalışmasında görülmüştür (Broadus, 1987; Tatar ve Ece, 2012). Lawani (1981), ise ilk bibliyometrik araştırmanın 1917 yılında, Cole ve Eales tarafından ortaya konulduğunu öne sürmektedir. Sengupta (1992) bilinen ilk bibliyometrik araştırmanın 1896’da Campbell tarafından yapılan “Theory of the National and International Bibliography” isimli yayın olduğunu ileri sürmektedir.

Türkiye’de Kürtçe literatüre baktığımızda çok sınırlı sayıda bibliyografik ve bibliyometrik nitelikte çalışma yapıldığını görmekteyiz. Aykaç (2017), 2011 ve 2016 yılları arasında Türkiye’de Kürt Dili ve Edebiyatı-Kültürü alanında Kürtçe (Kurmancca-Kirmancca/Zazaca) yazılan yüksek lisans tezlerinin bibliyografik incelemeyi merkeze aldığı çalışmasında, söz konusu dönemde yazılmış 121 yüksek lisans tezini bibliyometrik analiz tekniğini kullanmak suretiyle, hazırladıkları üniversiteleri esas alarak yazıldıkları lehçe, yıl ve tür yönünden tasnif ederek incelemiştir. Bu alanda bir diğer çalışma Aykaç, Güzel ve Çakar (2019) tarafından yapılmış olup, bu bibliyografik makalede ise Türkiye’de Kürt Edebiyatı-Kültürü bölümleri bulunan Bingöl, Dicle, Mardin Artuklu, Muş ve Yüzüncü Yıl üniversitelerinde 2012-2018 yılları arasında hazırlanan 241 yüksek lisans tezi incelenmiş, söz konusu tezler hem konularına göre sınıflandırılmış hem de yazarlarına göre listelenmiştir. Bibliyometrik analiz yönteminin de kullanıldığı çalışmayla Türkiye’de Kürdoloji sahasında ne tür çalışmaların yapıldığı ve hangi konulara ağırlık verildiği vb. soruların cevapları ortaya konulmuştur. Ertekin ve Güzel (2019), Bingöl Üniversitesi’nde Kürdoloji alanında yazılmış yüksek lisans tezlerini, tezsiz yüksek lisans projelerini, lisans bitirme ödevlerini ve aynı üniversite tarafından yapılan Kürdoloji konulu çalışmaları analiz etmişlerdir. Geyik, Şanlı, Acun vd. (2019) 2009-2019 yılları arasında Türkiye’de Kürdoloji alanında yazılan yüksek lisans tezlerini ve akademik dergilerde yayımlanan Kürtçe makaleleri incelemiş, listelemelere ve istatistiki tablolara yer vermek suretiyle farklı yönlerden analizler yaparak alanın genel bir envanterini sunmuşlardır. Kan (2019) ise Türkiye’deki Kürt akademisyen, yüksek lisans ve doktora programı öğrencileri tarafından 2009-2019 yılları arasında yazılıp yayımlanmış Kürtçe makaleleri değişik açılardan tasnif etmiştir.

## **2. Yöntem**

Bu çalışmada, Yükseköğretim Kurumu Ulusal Tez Merkezi (YÖKTEZ) veri tabanında Kürt Dili ve Kültürü ile Zaza Dili ve Edebiyatı alanında yayımlanan yüksek lisans tezlerinin çeşitli parametreler doğrultusunda bibliyometrik analizinin gerçekleştirilmesi amaçlanmıştır. Bu amaç doğrultusunda, çalışmada veri toplama yöntemi olarak belge incelemesi kullanılmıştır. 2013-2020 yılları arasında yayımlanan yüksek lisans tezleri araştırma kapsamına dâhil edilmiştir. Çalışma kapsamındaki yüksek lisans tezleri için, YÖKTEZ arama motorunda her ikisi ayrı ayrı olmak üzere “detaylı arama” seçeneğinden Üniversite segmentinde “Mardin Artuklu Üniversitesi” Enstitü segmentinde “Yaşayan Diller Enstitüsü”

Tez Türü seçeneğinde “Yüksek Lisans” seçeneği seçilerek tarama yapılmıştır. Bu amaçla 2013-2020 yılları arasında yayımlanan tezler kayıt altına alınarak bibliyometrik künyeleri elde edilmiştir. Yapılan tarama sonucu 49 yüksek lisans tezine rastlanmıştır. İlgili adreste devamlı güncellemeler ve yeni tezlerin ekleme işleri yapıldığından dolayı tarama işlemine 01.08.2020’de başlanmış ve 20.09.2020’de sona erdirilmiştir. Bu süre zarfında yapılan güncellemeler ve yazarlarınca erişim kısıtlaması getirilen 2 yüksek lisans tezinin dijital versiyonları temin edilmiş, gerekli kontroller gerçekleştirildikten sonra veri dosyasına nakledilmiştir.

Education in mother tongue has an important place for nations to pass on their mother tongue to future generations and for the continuation of the culture. Every nation works sensitively to prepares education programs in mother tongue. The most important material in the implementation of the education program in mother tongue are textbooks. For this reason, it is crucial that the prepared textbooks are appropriate and sufficient for the development levels of the students. Since 2012, Kurdish language has been offered to the students of the secondary schools as an elective course. Since then, two textbooks have been prepared by the Ministry of National Education to teach Zaza language in 5th grade. In this study, we compare these two textbooks used in Zaza lessons in terms of social gender equality. The results show that both textbooks were prepared in a way to strengthen social gender inequality.

**Keywords:** Zazaki, Zazaki textbooks, Gender, Education, Education in Zazaki

### Destpêk

Mefhûmê zayende (sex), hetê bîyolojîk ra cinîbîyayîş û camêrdîyayîşî, yanî makîbîyayîş û nerîbîyayîşê leşî pênas kena. Goreyê cîgêrayîşê Kirkanî (2020: 144) gender xususen seba zayenda komelkî yena şuxulnayene. Ma do zî seba genderî zayenda komelkî bişuxulnê. Cinîbîyayîş û camêrdîyayîş tena bi azayê zayende ya girêdaye nîyê. Merdimêk azayê xo yê zayendî vîndî bikero zayenda ci zî vîndî nêbena û zayenda ci nêvurîyena. Coka tena zayenda bîyolojîke nêşkena zayendî pênas bikera (Başar, 2014: 247). Zayenda komelkî yanî gender zî cîyakerdişê goreyê tewgeran û zayendan a û rol û berpirsiyarîyê cinî û camêrdan gêna xo mîyan, malbatî mîyan de zîl dana û goreyê mekan û zamanî toşe gêna (Aktaş, 2011: 52). Zayenda komelkî (gender) cînsiyetê bîyolojîk ra cîya vateyêkî hewênena. Qeçekî verêr malbatî mîyan de musenê ke kênekîyayîş û lajebîyayîş çî yo û no zî rayîrî akeno ke rolê zayendîye bêrê awankerdiş (Asan, 2010: 65). Rolê ke cinîyan ra û camêrdan ra yenê pawitiş goreyê her komelî, zayenda bîyolojîk ra ata goreyê vateyê binê cinîbîyayîş û camêrdîyayîşî yanî goreyê zayenda komelkî ameyê awankerdiş. Her komel rol û berpirsiyarîyanê cinî û camêrdan goreyê taybetmendîyanê xo awan keno. Merdimêk, bi hawayêko kulturê komelî dir girêdaye makîbîyayîş û nerîbîyayîşî ra vejîyeno û beno cinî û camêrd. Zayenda komelkî, merdiman hetê psîko-sosyalî ra erjneno û înan sey cinî û camêrdî pênas keno (Dökmen, 2004: 38). Rol û berpirsiyarîyê ke hetê komelî ra seba cinî û camêrdan ameyê dayîş zayenda komelkî awan kenê. Rolê ke zayendî ser o yenê barkerdîş, bîyolojî ra eleqedar nîyê la bi rayîrî û qaydeyê komelî dir girêdaye yê û amancê zayenda bîyolojîke no yo ke nê rolan bido dewamkerdiş. Nê rayîrî û qaydeyê komelî, musayîşê binhişmendî yê ke prosesê komelbîyayîşî de verêr malbatî mîyan de û dima zî perwerdeyî mîyan de xurt benê û resenê azê bînan. Sîstemê pederşahî de remz û nişaneyê ke cinîyan pênas kenê hetê cinîyan ra nêameyê ronayene. Seba ke hem cîhanê prîmîtif û hem zî cîhanê şaristanî

cîhanê camêrdan o, fikrê ke cinîyan ser o ameyê awankerdiş zî sereyê camêrdan ra vejîyayê (Millet, 2011: 83).

Goreyê îdeolojiyê zayendperestî cinîbîyayîş; her qadê komelî de pênasêbîyayîşê goreyê camêrdî yo. Cinîbîyayîş no yo ke, ganî têwgêrê ke aîdê camêrdî yê nîrê nîşandayîş, ganî hîs û fikirî goreyê camêrdî bêrê awankerdiş. Goreyê îdeolojiyê zayendperestî ganî cinî pasîf bê, ganî hestîyar û zerîzîz bê ke aqilê xo hendê hîsanê xo nêşuxulnê. Bêçare bê û muhtacê camêrdî bê. Sînorê cinîyan mayebîyayîş û cinîya yew camêrdî bîyayîş o. Perwerdeyo ke cinîyan rê do bêro dayîş bi şertê ke do nê sînoran îxlal nêkero hetê komelî ra yeno qebulkerdiş (Helvacioğlu, 1996: 13). Coka hetê zayenda komelkî ra û hetê zayendperestîye ra cigêrayîşê dezgehanê perwerdeyî û taybetî zî cigêrayîşê kitabanê dersan zaf muhîm û hewce yo.

Sîstemê perwerdeyî de hem bi rayîranê prosesê zanayîşî ke wendegehan de yenê pêşkêş kerdene, hem zî bi kulturê ke wendegehan de yeno musnayîş, hukmê zayendperestî, rayîr û qaydeyê komelî reyna yenê xurtkerdiş (Özaydınlık, 2014: 106).

Tirkîya de awanîya komelî bandoreya camêrdî ser o ya û no hawa elbet sîstemê perwerdeyî ser o zî tesîrê xo viraşt. Rolê ke komelî cinî û camêrdan ser o bar kerdê verdibistanî ra heta peynîye dewam kenê û qeçekî seyyewbînan nêbîyayîşê nê rolan fehîm nêkenê. Awanîya malbatî û komelî patrîyarkal o û sîstemê perwerdeyî zî nê sîstemê patrîyarkal dano xurt kerdene. Erj û rolê ke malbatî mîyan de qeçan ser o yenê barkerdiş, wendegehan de zî yenê dewam kerdene. Rolê ke kênek û lajekan ra yenê pawitiş, verêr malbatî mîyan de bi hawayêko nimite yan zî bi hawayêko eşkere yenê waştîş (Tan, 2000: 23). Wendegehan de bi rayîrê mamostayan, kitabanê dersan û bi rayîrê mufredatî seyyewbînan nêbîyayîşê zayenda komelkî yeno xurt kerdene (Sayılan, 2012: 49). No problemo seyyewbînan nêbîyayîşê zayenda komelkî her qademeyê perwerdeyî de dewam keno û coka seyyebînan nêbîyayîşê zayendan sey tewirê tewr diyarcker û eşkere yo. Dezgehê perwerdeyî zî reyna seyyewbînan nêbîyayîşê zayenda komelkî xurt kenê û tewr newe ra awan zî kenê. Wendegehan de erj û rolê patrîyarkal û camêrdperestî wendekaran rê yenê musayîş (Asan, 2010: 66). Kitabê dersan bi hawayêko eşkere yan zî bi hawayêko nimite û mîyanî têwgêrê ke hetê komelî ra ameyê qebûl kerdene, urf û adet û toreyan, mît û vatîşan neql kenê û fonksîyonê xo yê komelkî anê ca. Bi nê fonksîyonanê xo kitabê dersan seba pawitişê sîstemê komelî û dewamkerdişê erjanê komelî rolêka gird gêne xo milî ser.

Tirkîya de plankerdişê perwerdeyî ra heta amanc û muhtewaya programanê perwerdeyî, heme materyalê hetkar û pedagojîk ra heta kitabanê dersan, heme çîyê perwerdeyî hetê Wezaretê Perwerdeyî ra û bin kontrolê Wezaretê Perwerdeyî de yenê hadirekerdiş. Seba perwerdeyê zîwanê kirmanckî yê sinifa pancine heta ewro di kitabî hetê Wezaretê Perwerdeyî ra ameyê hadire kerdene. Nê kitaban ra yew serra 2012î de, o bîn serra 2017î de ameyo weşanayene.

Tirkîyaye de heta verê çend serran zî wendegehan de dersê bi zîwanê kurdî çin bî. Qeçekî perwerdeyî bi zîwanê xo yê dayîkê nêvînê problemê pedagojîkî vejîyenê meydan û wendekarî dersan de ser nêkewnê. Coka ma gore problemê perwerdeyê bi zîwanê dayîke, hetê xo yê siyasî ra ata, ganî bi hawayêko pedagojîk bêro erjnayîş û çareserkerdiş.

Di kitabê musnayîşî yê kirmanckî ke ma înan ser o xebitîyayî, seba wendekaranê sinifa pancine ameyê hadirekerdiş. Kitabo yewin “KURDÎ 5 Zazakî” serra 2015î de ameyo hadire kerdene. Seba ke no kitab serra 2015î de ameyo weşanayene, ma do nê kitabî sey “kitabo yewin” qebul bikerê û “kitabo yewin” ra qesdê ma no kitab o.

Kitabo dîyin “MEKTEBO MÎYANÎN ZAZAKÎ KITABÊ MUSNAYÎŞÎ” yo ke serra 2017î de ameyo weşanayene. Seba ke no kitab serra 2017î de ameyo weşanayene, ma do nê kitabî sey “kitabo dîyin” qebul bikerê û “kitabo dîyin” ra qesdê ma no yo.

Sey heme dersanê zîwanan seba dursa zîwanê Kirmanckî zî materyalo ke derse de tewr vêşî yeno şuxulnayîş kitabê dersan ê û coka zî tekstê ke nê kitabîyan mîyan de yê zaf muhîmî yê. Eke tekstê kitabîyan dersan bi hawayêko raştameye û bêzanayîş bêre weçînayîş û cadayîş, o çax beno ke amancê xo ra dûrî bikewê û ser nêkewê.

Kitabê dersan ê tesîrdarî, wendekaran û perwerdeyî ser o feyde virazenê. Nê feydeyî wina yenê rêzkerdiş: Karê musnayîşî ke zafane bi rayîrê pêşkêşî yeno viraştîş, bi materyal û elemananê dîyayîşkî destek kenê û karê musnayîşî xurt kenê. Prosesê derse de hem seba wendekaran û hem zî seba mamostayan fersend akenê ke wendekar û mamostayî bieşkê reyna ageyrê babet û malumatîyan û bi no hawa wendekarî bieşkê zanayîşanê xo tetbîq bikerê. Bi rayîrê falîyetan fersend danê ke wendekarî bi hawayêko keyfweşî babetan bimusê. Fersend danê wendekaran ke wendekarî bieşkê xo bi xo bi hawayêko xoser zî bişuxulîyê. Fersend danê wendekaran ke wendekaran de fikirîyayîşo rexneyên awan bibo. Meraqê wendekaran vêşî kenê. Wendekaran teşwîqê xebitîyayîşî kenê (Kalıpcı, 2008: 31).

Kitabo dîyin de o yo ke ma tede cigêrayîşê xo yê zayenda komelkî kerd, lajekî palkursîyan ser o roşenê û cinî zî erdo roşenê yan zî pay ra vînderde yê. No kitab seba qeçê 9-10 serreyan ameyo hadire kerdene û qeçê ke nê serran de yê hîna hunerê fikirîyayîşê razberî qezenç nêkerdê û coka zanayîşê ke malbatî ra yan zî wendegehî ra gêne sey zanayîşê raşt û mutleq qebul kenê û no zanayîş hişmendîyê înan de ronîşeno. Zayendperestî nê kitabî de hem bi hawayêko dîyayîşkî û hem zî bi estanîk û vateyê verênan ameyo dayîş.

Kitabo dîyin de rîpelê 44. de malbatêk odayî de ronîşte yê û sohbet kenê, maya qeçekan înan ra dûrî ronîşte ya û goşdarîyê înan kena, a nêdekewna sohbetî mîyan. Kulturê ma de veyvan rê rolêk ameyo dayîş ke ganî sîstemê perwerdeyî cehd bikerdayêne ke nê musayîşî bişîknayêne, veyvî malbatî ra dûrî ronîşenê û eyb o



ke ê bi girdan ra, bi kal û pîran ra bikewê sohbetî mîyan. Nê mesajê ke bi hawayêko mîyanî (nimite) qeçan rê ameyê şirawitiş, hişmediyê înan de ca gêne û têwêgêr û fikirîyayîşê înan ser o tesîr kenê. Bi nê hawayî seyyewbînan nêbiyayîşê zayenda komelkî yeno pawitiş û neqlkerdiş. Nê kitabî de zî no rolê komelî nêameyo şiknayîş, ameyo dewamkerdiş û xurtkerdiş.



**Şekil 1: Malbatêk sohbet keno la maya qeçekan înan ra dûrî ronîşte ya.**

Rîpelê 103î yê kitabê dîyînî de qismê “EDEB U ADAB” de sûreyêk ameya dayîş. “Dadi, babi u merdîmanê xu rê holi bikerên. (Enfal-75)” Na sûre ser o resimêkî ameyo xêzkerdiş. Nê resimî de camêrd palkursî ser o ronîşte yo û cinî zî payan ser o vînderde ya. Sey ke ma vat, qeçê mabeynê 9-10 serran de yê hîna hunerê fikirîyayîşê razberî qezenç nêkerdê û coka zanayîşê ke malbatî ra yan zî wendegehî ra gêne sey zanayîşê raşt û mutleq qebul kenê. Qeçî do nê resimî ra fehm bikerê ke ganî camêrdî ronîşê û cinî zî payî ra vînderê. Kitabê dîyînî de her tim cinî kulinde de yê û şamî û werdişî virazenê (Varol ûêb., 2017: 114). No zî hişmendiyê qeçan de musayîşêkî negatîf û zayendperest virazeno.

Unîteya yewine ya kitabê dîyînî de lezvatokî ameyê dayîş. Nê lezvatokî wina yê:

“Cayê camerdi cor dî beno.

Cayê cahili cêr dî beno.

Vatoğ va, vateyanê verinan veramedên.


Verinan va, wa vatoği vateyanê ma vaci” (Kd, 16).

Nê lezvatokê ke tîya de ameyê dayîş, hêmayanê zayenda komelkî hewênenê û na xebata ma de ameyî rexnekerdiş. Çünke nê lezvatokan de camerdi sey cinsê berzî ameyê dayîş û hetê rolanê komelkî ra cayêko berz dayeyo camêrdan. No zî wendekaran ser o tesîrê xo do virazo û wendekarê lajekî do xo wendekaranê

kênekan ra berz bivînê. Bi nê hawayî cîyakerdişê zayendan yeno xurtkerdiş (Helvacıoğlu, 1996: 159).

Unîteya hîrêyîne ya kitabê dîyînî de Hesên dersa matematîkî ra, Usman dersa sporî ra, Heyder dersa fenî ra hes kenê labelê Elîf dersa muzîkî ra, Fatma dersa dînî ra û Şeyma dersa resimî ra hes kenê (Kd, 53). Dîyar o ke nê kitabî de elemanê zayendperestî estê û rolê kênekan ê yê ke komelî dîyar kerdê nê kitabî de zî ameyê xurt kerdene. Gureyî goreyê zayendperestîye ameyê barkerdîş. Nê kitabî de rolê zayendan newe ra ameyê awankerdiş û sîstemo camêrdperest nê kitabî de ameyo awan kerdene û xurt kerdene. Eleman û resimê ke nê kitabî de ameyê şuxulnayîş, zayenda komelkî danê dewam kerdene.

Unîteya pancine de resimêk ameyo xêzkerdiş. Nê resimî de kalêk nêweş o û cayî mîyan de dergbîyaye yo. Ey het de di cinî, yew camêrd û yew qeç estê. Camêrd kêlekê kalî de kursî ser o ronîşte yo û cinîya ciwan û cinîya pîr pay ra vinderde yê. Nê resimî rolê cinîyan ê yê ke komelî înan ser o bar kerdê girewto xo mîyan û no resim seyyewbînan nêbîyayîşê zayenda komelkî xurt keno (Kd, 103).



**Şekil 2: Camêrd palkursî ser o ronîşte yo û cinîya ciwan û cinîya pîr pay ra vinderde yê.**

Kitabê dîyînî de tena cinî kulinde de şamî (werd) virazena û firaqan şuwena. Nê rolê ke komelî milê cinîyan ser o bar kerdo nê kitabî de zî ameyê şuxulnayene. Kêneka qeç zî seba ke nê rolî qeçeyî ra bigîro cinîya kulinde het de ameya resimkerdiş. No rol maye ra ravêreno kêneke. Unîteya şeşin de nimûneyêk wina esta (Kd, 114).

UNITE YA  
6. QISIMÊ DIYIN • WER U ŞIMITIŞ

Ç Goştari bikerên u bîwanên



**Gulizar:** Dayê tî se kena?  
**Dadi:** Ez wer pocena.  
**Gulizar:** Tî çıta pocena?  
**Dadi:** Ez mastuwa, zerbet u xoşaw virazena.  
**Gulizar:** Tî mastuwa pê çitayî virazena?  
**Dadi:** Ez pê rîz, du u run virazena.  
**Gulizar:** Tî mastuwa seni virazena?  
**Dadi:** Ez verco du girênena, dîma rîz kena miyan. Heta hest bo ez pocena. Peyni dî zi run kena ser.  
**Gulizar:** Emşo şamiya ma weş a. Ez mastuwa ra zaf hes kena.

Se u çaryes 114

### Şekil 3: Cinî kulinde de şamî virazena û kênek zî aye het de nê rolî gêna.

Unîteya hewtine ya kitabê yewinî de rîpelê 104. de çar kayî ameyê resimkerdiş. Nê kayî; nimitik, lenglengo, çûnçûwa û xare yê. Resiman de aseno ke kayê nimitikî lajekî û kênekî yewbînan reyde kay kenê, kayê lenglengoyî tena kênekî kay kenê û kayê çûnçûwa û xareyî zî tena lajekî kay kenê.

Unîteya hewtine ya kitabê diyinî de rîpelê 124. de resimêk ameyo xêzkerdiş û nê resimî de hîrê kênekî lengleng kay kenê. Dîyar o ke kayî her di kitabên de goreyê rolê komelkî, zayenda komelkî ameyê resim kerdene. Rolê ke komel qeçkekeyî ra kaykerdişî de însanan ser o bar keno nê di kitabên de ameyê dewamkerdiş û bi nê dewamkerdişî ameyê xurtkerdiş.

Beşê “Dêki” yê unîteya hewtine ya kitabê dîyinî de çend çibenokî ameyê persayîş. Nê çibenokan ra yew wina ya: “Azan vendeno nîmac nêkeno, cini geno mare nêkeno” (Kd, 130). No çibenok vatişêko zayendperest yanî camêrdperest hewêneno û ney zî bi hawayêko zaf eşkere keno. Nê çibenokî de mesajo zayendperest nimite nîyo. Zaf muhtemel o ke hişê qeçekan de bêro viraştîş ke camêrdî cinîyan gênê û heqê cinîyan çin o ke camêrdan bigîrê. Camêrdî gênê û cinî nêşkenê vajê ney. Rolê komelî ke cinî nêşkenê vajê nê û camêrdî cinîyan gênê, bi nê çibenokî binhişmendîya qeçekan de awan beno. Kitabê dîyinî de zîwanêko zayendperest ameyo şuxulnayîş.

Her di kitabanê dersan de metnan mîyan de û resiman de cinî û camêrdî bi çî nisbetî ameyê dîyene Tablo 1. de ameyo dîyarkerdiş:

**Tablo 1: Metin û resiman de nîsbetê asayîş û qiseykerdişê cinî û camêrdan**

<b>Kurdî 5 Zazakî</b>		<b>Mektebo Miyanin Zazaki Kitabê Musnayîşi</b>	
<b>Kênekî</b>	<b>Lajekî</b>	<b>Kênekî</b>	<b>Lajekî</b>
55	106	95	124

Kitabê yewinî de 55 nîgarê (figür) cinîyan û 106 nîgarê camêrdan ameyê resimkerdiş. Kitabê dîyinî de 95 nîgarê cinîyan û 124 nîgarê camêrdan ameyê resimkerdiş. Kitabê dîyinî de hûmarê cinîyan zî camêrdan zî goreyê kitabê yewinî hîna vêşî yê labelê her di kitaban de zî hûmarê camêrdan hûmaranê cinîyan ra vêşêrî yê.

Her di kitabanê dersan de goreyê zayendîyî vilabîyayîşê gure û meslekan Tabloyê 2. de ameyo dîyarkerdiş:

**Tablo 2: Goreyê zayend resîm û metnan de vilabîyayîşê gure û meslekan**

<b>Kurdî 5 Zazakî</b>		<b>Mektebo Miyanin Zazaki Kitabê Musnayîşi</b>	
<b>Kênekî</b>	<b>Lajekî</b>	<b>Kênekî</b>	<b>Lajekî</b>
Wendekar	Wendekar	Wendekar	Wendekar
Hemşîra	Berber	Keyver	Mamoste
Doktor	Doktor	Mamosta	Citkar
	Nanpewj	Doktor	Şiwane
	Wetayê dêsan	Mîmar	Deyîrbaz
	Gîşekar		Nanpewj
	Deyîrbaz		Mişag
	Pêşkêşkarê sîrkî		Asinger
			Solderz
			Necar
3	8	5	10

Her di kitaban de gure û meslekî goreyê cinî û camêrdan ameyî cîgêrayîş. Sey netîce vejîya orte ke kitabê yewinî de cinî 3 gureyê cîyayî kenê labelê camêrdî 8 meslekê cîyayî kenê. Kitabê dîyinî de cinî 5 gureyê cîyayî kenê labelê camêrdî 10 meslekê cîyayî kenê.

Her di kitabanê dersan de zayendîyo ke beşê keyeyî mîyan de aseno Tablo 3. de ameyo diyarkerdiş:

**Tablo 3: Her di kitabânê dersan de zayenda komelkî ya ke beşê keyeyî mîyan de asena**

Kurdî 5 Zazakî	Mektebo Miyanin Zazakî Kitabê Musnayîşi			
	Kênekî	Lajekî	Kênekî	Lajekî
Şamî pewtiş	–	–	+	–
Debara keyeyî	+	+	+	+
Spor kerdiş	+	+	+	+
Bîsiklet, erebe ramitiş	–	+	–	+
Mûnayene	–	–	+	–
Perwerde girewtiş	+	+	+	+

Zayenda ke beşê keyeyî mîyan de asena seba her di cînsan, her di kitabânê dersan de seyyewbînan nîyo. Kitabê yewinî de pewtişê şamî seba her di cînsan zî nêaseno, labelê kitabê dîyinî de cinî şamî pewjenê û camêrdî nêpewjenê. Kitabê yewin de kênekê ke bîsiklet yan zî erebe ramenê nêasenê labelê lajekî bîsiklet û erebe ramenê. Kitabê dîyinî de zî eynî hawa esto û kênekî erebe nêramenê labelê lajekî erebe ramenê. Kitabê yewinî de mûnayene seba her di cînsan zî nêaseno labelê kitabê dîyinî de cinî mûndîşî kenê û camêrdî nêmûnenê.

Her di kitabânê dersan de zayendîyo komelkî hetê dirûvî ra senîn aseno Tablo 4î de ameyo dîyarkerdiş:

**Tablo 4: Hetê dirûvî ra zayenda komelkî ya ke her di kitabanê dersan de asena**

	<b>Mektebo Miyanin Zazaki Kitabê Musnayîşi</b>			
	<b>Kênekî</b>	<b>Lajekî</b>	<b>Kênekî</b>	<b>Lajekî</b>
Pakî	-	-	+	-
Çiyê xemlî	+	-	+	-
Şuxulnayîşê rengê pembeyî	+	-	+	-
Şuxulnayîşê rengê kewe	+	+	+	+
Poro derg	+	-	+	-
Poro kilm	+	+	+	+
Pantol	+	+	+	+
Sere girewtîş	-	-	+	-

Metn û resimê her di kitaban ameyî cîgêrayîş seba ke zayenda komelkî ke her di kitabanê dersan de ca girewto bêro vînayîş. Kitabê yewinî de kam pakîya keyeyî keno nêaseno labelê kitabê dîyinî de cinî pakîya keyeyî kenê. Kitabê yewinî de û dîyin de lajekan xemlî nêkerdê xo ya û xo nêxemilnayê labelê kênekan xo xemilnayo. Her di kitaban de zî kênekî bi poro kilm asenê labelê lajekî bi poro derg nêasenê. Kitabê yewinî de kênekî bi sere girewte nêameyê resimkerdiş labelê kitabê dîyinî de kênekî bi sere girewte ameyê resimkerdiş. Her di kitaban de zî kênekî bi rengê keweyî ameyê resimkerdiş labelê lajekî bi rengî pembeyî nêameyê resimkerdiş.

Her di kitabanê dersan de zayenda komelkî ziwani mîyan de senîn ameyo şuxulnayîş Tablo 5. de ameyo dîyarkerdiş:

**Tablo 5: Hetê zıwanî ra zayenda komelkî ya ke her di kitabânê dersan de asena**

<b>Kurdî 5 Zazakî</b>	<b>Mektebo Miyanin Zazaki Kitabê Musnayîşi</b>
	“Azan vendeno nımac nêkeno, cini geno mare nêkeno.”
	“Cayê camerdî cor dı beno. Cayê cahili cêr dı beno.”
	“Dadiya Berfîn pê awa sabunın keye pak kerden.”
0	3

Çekuye, cumle, vateyê verênan ê yê ke her di kitabân de estê ameyî analîz kerdene û dîyar bî ke kitabê yewinî de qet qiseyê zayendperest nêasayê labelê kitabê dîyini de hîrê finî qiseyê zayendperest ameyê şuxulnayîş.

109

Her di kitabânê dersan de zayenda komelkî mekanî mîyan de senîn ameyo şuxulnayîş Tablo 6. de ameyo dîyarkerdiş:

**Tablo 6: Hetê mekanî ra zayenda komelkî ya ke her di kitabânê dersan de asena**

	<b>Kurdî 5 Zazakî</b>		<b>Mektebo Miyanin Zazaki Kitabê Musnayîşi</b>	
	<b>Kênekî</b>	<b>Lajekî</b>	<b>Kênekî</b>	<b>Lajekî</b>
Keye û derûverê keyeyî	10	22	28	26
Wendegeh û derûverê wendegehî	2	5	9	13
Teber	21	41	18	33

Her di kitabânê dersan de nisbetê şuxulnayîşê cinî û camêrdî mekanî de Tablo 6. de ameyo analîzkerdiş. Dîyar o ke her di kitabânê dersan de zî lajekî tewr vêşî



mekanê teberî de û cinî zî tewr vêşî mekanê zereyî de ameyê xêzkerdiş. Hûmarê cinîyan nê hîrê meknan de yanî keye, wendegeh û teberî de, her di kitaban de zî goreyê camêrdan kêmi yê.

### **Peyniye**

Goreyê neticeyanê nê cigêrayîşî, figurê cinî û camêrdan ê yê ke nê her di kitabanê dersan de ameyê şuxulnayîş, meknan de, bi rayîrê ziwani, hetê durûvî ra, hetê karbeşîyê keyeyî ra, goreyê zayenda komelkî ameyê awankerdiş. Hûmarê cinî û camêrdan seyyewbînan nîyê û camêrdî cinîyan ra hîna vêşî ameyê resimkerdiş. Cinî tewr vêşî sey mamosta û maye ameyê resimkerdiş. Lajekî bi top, çuwe û ûsn. ameyê dayîş û kênekî zî bi bendik, veyveke ûsn. ameyê resimkerdiş. Teber de camêrdî cinîyan ra hîna vêşî ameyê cadayîş.

Kitabê dîyini de hem bi rayîrê resiman hem zî bi rayîrê metnan fikirîyayîşê zayendperestî newedîla awan bîyo û rolê ke komelî dayê cinî û camêrdan ser, nê kitabî de ameyê şuxulnayîş. Lajekî palkursîyan ser o ronîşenê û cinî zî erdo ronîşenê yan zî pay ser o vinderde yê. No kitab seba qeçanê 9-10 serreyan ameyo hadire kerdene û qeçê ke nê serran de yê hîna hunerê fikirîyayîşê razberî qezenç nêkerdê û coka zanayîşê ke malbatî ra yan zî wendegehî ra gênê sey zanayîşê raşt û mutleq qeçul kenê û no zanayîş hişmendîyê înan de roşeno. Zayendperestî nê kitabî de hem bi hawayêko dîyayîşkî û hem zî bi estanik û vateyê verênan ameyo dayîş. Nê kitabî de ziwaneke zayendperest ameyo şuxulnayîş.

Netîceyê tehlîlkerdişê nê her di kitaban de ameyo fehmkerdiş ke nîgarê qeçekan û pîlan ê meknan de ameyê resimkerdiş ke goreyê qalibanê zayenda komelkî ameyê awankerdiş. Qeçekî û pîlî reyna goreyê qalibanê zayenda komelkî, yewbînan reyde ameyê cadayîş û qeçekî û pîlî bi faelîyetanê goreyê zayenda komelkî ameyê beşkerdiş. Ame dîyayîş ke kênekî goreyê lajekan hîna tena ameyê resimkerdiş û berpirsiyariyê mayebîyayîşî zaf finî ameyo dûpatkerdiş. Ame tespîtkerdiş ke karbeşîyo keyeyî mîyan de reyna goreyê zayenda komelkî ameyo dewamkerdiş. Hem metnan mîyan de û hem zî resiman de lajekî hîna aktîfî yê û kênekî pasîf ameyê mojnayîş.

### **Çimeyî**

- Aktaş, G. (2011). Farklı sosyoekonomik ve kültürel özelliklere sahip ailelerde kız çocuklarına ilişkin aile içi kültürel tanımlamalar. Yayınlanmamış Doktora Tezi. Ankara: HÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Asan, Hatice T. (2010). Ders kitaplarında cinsiyetçilik ve öğretmenlerin cinsiyetçilik algılarının saptanması. *Fe Dergisi: Feminist Eleştiri*, Ankara, (66-74).
- Başar, K. (2014). Farklı Yönleri İle Cinsel Kimlik: Bedensel Cinsiyet, Cinsiyet Kimliği, Cinsiyet Rolü Ve Cinsel Yönelim. *Toplum Ve Hekim Dergisi*, Ankara, (245-251).
- Dökmen, Z. Y. (2004). Cinsiyet kalıp yargılarının ve cinsiyet rollerinin sonuçları. *Toplumsal cinsiyet*. İstanbul: Sistem Yayıncılık.

- Helvacıođlu, F. (1996). Ders kitaplarında cinsiyetçilik. İstanbul: Kaynak Yayınları.
- Kalıpcı, G. (2008). İlköğretim 1998 ve 2004 Sosyal Bilgiler Dersi Öğretim Programlarına Göre Yazılmış 4.ve 5. Sınıf Ders Kitaplarının Öğrenme Anlayışları, İçerik ve Kullanılabilirlik Açısından Karşılaştırılması. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. İstanbul: MÜ. Eğitim Bilimleri Enstitüsü.
- Kırkan, A. (2020). Zazakî de Zayend. Bingöl Üniversitesi Bingöl Araştırmaları Dergisi, Bingöl, (141-167).
- Millett, K. (2011). Cinsel Politika (Sexual Politics). S. Selvi (çev). İstanbul: Payel Yayınevi.
- Özaydınlık, K. (2014). Toplumsal cinsiyet temelinde Türkiye’de kadın ve eğitim. Sosyal Politika Çalışmaları Dergisi, (33), Ankara, (93-112).
- Sayılan, F. (2012). Toplumsal cinsiyet ve eğitim. Ankara: Dipnot Yayınları.
- Tan, M. (2000). Eğitimde kadın erkek eşitliği ve Türkiye gerçeđi, kadın erkek eşitliğine doğru yürüyüş. Eğitim, Çalışma yaşamı ve siyaset. Ankara: TÜSİAD Yayınları.

## NUŞTOXÊ ÇIMEYANÊ TEWR VERÊNANÊ KIRMANCKÎYAN Û NUŞTEYÊ ÎNAN (1798-1903)\*

Veysel YILDIZHAN<sup>1</sup>

### KILMNUS

Na xebate, seba tesbîtkerdiş û dayîşşinasnayîşê nuştox û nuşteyanê kirmanckîyan (zazakîyan) yê tewr kehenan ra amade bîya. Nê metnê kehenî mabênê serranê 1798î û 1903yî de nusîyayê yan zî weşanîyayê. Bi na xebate seyrê nusîyayîşê kirmanckî peynîya seserra 18. ra heta destpêkê seserra 20. teqîb beno. Nuştoxanê nê metnan ra di kesî kirmanckî, ê bînî rûs, alman, îngiliz û bulgar ê. Çekuyê ke nê metnan de yê, firsend danê ke mintiqayê nê nuşteyan ca bibê, alfabe yê ke heta ewro seba nuştîşê kirmanckî şuxilîyayê bivînîyê û vurîyayîşê înan zîwanê ewroyî reyde bidîyo pêver. Labelê seba ke kirmanckî hem hetê sîyasî ra wayîrê merkezanê berde waman nêbîyî, hem zî zîwanê xo manaya kamîle de nêşayî bikerê zîwanê nuştîş û edebîyatî, metnê mendeyê ke nika destê ma de yê hîna vêşêr hetê orîyantalîstan ra amade bîyê. Na rewşe zî hem resayîşê çimeyan de zehmetî vejena hem zî seba xebetêka diakronîke teqîbkerdişê prosesêkê bêbirîyayîşî nêdana dest.

**Kildçekuyî:** Metnê verênî, xebatê orîyantalîstan, metno tewr verên, alfabe yê kirmanckî (zazakî), nuştoxê kirmanckî (zazakî).

### The Writers of the Oldest Sources in Kirmanckî and Their Writings (1798-1903)

### ABSTRACT

This study is prepared with the aim of identifying and introducing the earliest texts in Kirmanckî (Zaza) language and their authors. These texts were written or published between 1789 and 1903. With this study, the course of Kirmanckî language writing is studied from the end of the 18th century to the beginning of the 20th century. Two of the authors of these texts are Kirmanckî, while the others are Russian, German, British and Bulgarian. Thanks to the words in these texts, the regions to which the texts belong can be determined, the alphabets used for writing in Kirmanckî language until now can be seen and the changes of the words can be compared with today's language. However, since the Kirmancks both have not been able to have their own ongoing political centers and could not make their language that of writing and literary in its fullest sense, the remaining texts were prepared mostly by orientalist. This situation both causes difficulties in accessing resources and does not give an opportunity to follow an uninterrupted process for a diachronic study.

<sup>1</sup> Zanîngeha Dicleyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Xwendekarê Doktorayê, [vyildizhan@outlook.com](mailto:vyildizhan@outlook.com), <https://orcid.org/0000-0002-0419-2789>

\* Seba ke arşivê xo ra çimeyê muhîmî dayî, tim bi dildarî fikrê xo vatî û rayîr mojna mi, ez Mamosta Malmîsanîjî rê sipas kena. Keyeyê ci awan bo.

**Article Type/Makale Türü:** Research Article / Araştırma Makalesi

**Received / Makale Geliş Tarihi:** 14.07.2020

**Accepted / Makale Kabul Tarihi:** 28.10.2020

**Doi:** 10.35859/jms.2020.769689

**Keywords:** Old texts, studies of orientalist, the oldest text, Kirmanccian (Zaza) alphabets, Kirmancc (Zaza) authors

## En Eski Kirmancca Metinlerin Yazarları ve Yazıları (1798-1903)

### ÖZ

Çalışma en eski Kirmancca (Zazaca) metinlerin ve yazarlarının tespit edilmesi ve tanıtılması amacıyla hazırlanmıştır. Metinler 1789 ile 1903 yılları arasında yazılmış veya yayınlanmıştır. Çalışma ile Kirmancca yazının seyri 18. yüzyılın sonunda 20. yüzyılın başına değin takip edilmektedir. Metinlerin yazarlarından ikisi Kirmanca diğerleri ise Rus, Alman, İngiliz ve Bulgardır. Metinlerde bulunan sözcükler sayesinde metinlerin ait oldukları bölgeler tespit edilebilmekte, bugüne kadar Kirmancca yazım için kullanılan alfabeleri görülmekte ve değişimlerini bugünün diliyle karşılaştırılabilmektedir. Fakat Kirmancca hem devam edegelen siyasi merkezlere sahip olamamaları hem de dillerini tam anlamda yazı ve edebiyat dili yapamadıklarından şimdiye kalan metinler daha çok oryantalistler tarafından hazırlanmışlardır. Bu durum hem kaynaklara ulaşma noktasında sıkıntı çıkardı hem de diakronik bir çalışma için kesintisiz bir süreci takip etme fırsatı vermedi.

**Anahtar Sözcükler:** Eski metinler, oryantalistlerin çalışmaları, en eski metin, kirmancca (zazaca) alfabeler, kirmancca (zazaca) yazarlar.

### Destpêk

Ziwano nuştekî maneno meseleya Gîlgamêşî. Seke yeno zanayîş herçend Gîlgamêş bi xo bimiro zî nuşte, bêmergî û cawîdanî daye efsaneya ey. Bikilmî nusîyayîş seba yew ziwani enstrumanêko winasî yo ke bi îşaretanê bêvengan, ê ziwani ganî verdano. Bi sembol û xêzan vengê ziwani çarnenê reşbelean û heta ke yewna fek yan hîş veng bido înan, manenê. Ziwane ke nusîyayê, xo dima tena rîpelanê murekebinan ney, yew kultur zî verdanê. Benê çimeyê xeylê beşanê zanayîşan. Wesîqeyê mendeyî pêro, dewlemendiya ziwani û prosesê vurîyayîşê ê ziwani anê verê çimanê wendoxan. Ma şenê nê nuşteyanê mendeyan sey muzeya ke tede çekuyê seserran estê, texeyul bikê.

Nuştiş zî sey xeylê hewcedariyan reyna bi destê însanan seba tekilîyanê rojaneyan dest pêkerd. Nuşteyê tewr verênê ke qet nêmanenê nuşteyanê ewroyênan Îsayî ra ver hezarserra IV. ra mende yê ke nê tabletê kîlênî zêdeyêrî derheqê dayîş-girewtîşê bazirganane de seba qeydê hesabî amade biyê (JEAN, 2018: 13). Dima vera-vera hem sîtilê nuştişî şeklêko bîn girewt hem zî hacetê ke seba nuştişî yenê xebitnayîşî vurîyayî. Ma ewro xeyrê nuştiş û nuşteyan tufananê pîlan ra heta meselayanê eşqanê verênan hayîdar benê û ewro êdî mecrayê xo bivurno zî nuştiş û nuşte, însanan reyde tekilîyanê ma rê hetkarîya xo de berdewam ê.

Kurdan key û çira dest bi nuştişî kerd, hewna bipêroyî dîyar nîyo. Seba ke kurdî welatêkê hera û mintiqayanê yewbînan ra îzoleyan de ciwîyenê û lehçeyê înanê cîyayî estê, mabênê xo de çî ziwaneke muşterekî ser o konsensusêk viraşto çî zî nuştişê xo kerdo yew. Her lehçe warê xo de û mecraya xo de herikîyayo û resayo ewro.

Kirmanckî de metnê tewr verênî ser o tayê munaqeseyî estê. Goreyê cigêrayîşanê ma, lîtareturê kirmanckî de metno tewr verên serra 1798î de nusîyayo. No metn hetê Sultan Efendî ra ameyo nuştiş labelê xercê di rîpelanê nêzdîyê se çekuyan, destê ma de nê metnî ra taba çin o û çîyê ke ma derheqê nê metnî de zanênê, ma înan meqaleyê Mustafa Dehqanî ra musenê û çî heyf ke o bi xo na xebata xo pey de nêvîndeno û metnê orîjînalî nêvejeno verê cigêrayox û mereqdaran. Eke ma seba ke bi şik û şubheyî nê metnê Sultan Efendî hetêk a ronê, metno tewr verên destê Peter Lerchî ra serra 1856î de amade bîyo ke nê metnî zî fekê mehkumanê Roslawî yê kurdanê ke herbê Qırım de kewtê destê rûsan ra ameyê arêdayîş. 1856 de yewna metno ke tede çekuyê kirmanckî estê, weşanîyaya; xebata Robert Gordon Lathamî. Ey ra dima ma şenê nameyanê nuştox û amadekeran wina rêz bikerê; Otto Blau (1862), Petko Slaveykov (1872), Ehmedê Xasî (1899) û Albert Von Le Coq (1903). Seba ke na xebate mabênê serranê 1798î û 1903yî de sînorke de ya, ma do tena bala xo bidê nê serran.

Nê çimeyî bi alfabe yanê cîyayan nusîyayê û amancê nuştişê înan zî bipêroyî eynî nîyo. Cora na meqale de ma do beşê yewinî de goreyê nuştoxanê nê nuşteyan tesnîfêk virazê û nê xebatan bidê şinasnayîş. Beşê dîyînî de zî ma do alfabe yê nê metnan bi nimuneyan sey tabloyî bidê.

## 1. Nuştoxê Çimeyanê bi Kirmanckîyan (Zazakîyan) û Nuşteyê Înan

### 1.1. Sultan Efendî (?-?)

Çimeyo tewr verên ê kirmanckî hetê Sultan Efendî yanî Îsa Beg bin ‘Elî’ ra serra 1798î de nusîyayo. No metn di "meqale"yan ra virazîyayo û derheqê elewîti û şarê Dêrsimî de yo. No metn seba ke heta ewroyî temamen nêweşanîyayo û ma tena mîyanê meqaleya Mustafa Dehqanî de derheqê ey de melûmatan vînenê, biguman o. Goreyê Dehqanî, Sultan Efendî yew şîyo ke bi ihtîmalê girdî binê tesîre mezhebanê îmamî (Îmāmî) û xalî (Ghālî) de mendo (Dehqan, 2010). Seba ke meqale de metnê Sultan Efendî ra nêzdîyê 98 çekuyî neql bîyê û goreyê tarîxî metno tewr verên no yo, ma zî na xebata xo de ca da nê metnî. Labelê ganî merdim bi ihtîyat nêzdîyê nê metnî bibo. Alfabe yanê metnê Sultan Efendî alfabe yanê erebkî ya. Çekuyanê kirmanckîyan yê Sultan Efendî ra fehm beno ke ey kitabê xo bi fekê mintiqaya Sêwregî-Çêrmûge nuşto.<sup>2</sup> M. Dehqanî meqaleya xo de destpêk û peynîya nê metnî ra di rîpelî neql kerdê. Nê metnan ra peynîya metnê yewinî (r. 11) de, di satirî kirmanckî yê. M. Malmîsanij û Ahmet Kirkanî nê di satirî herfanê erebkî ra açarnayî herfanê latînkî. Uca wina nuşte yo:

"Kitabê Sultan Efendî ra gor[ê?] muqeddîme[,] şagirdê Sultan ci ra pers kenê[,] manê[?] na mesela çik o[.] O cewab dano[,] hetta sîrrê hukumranîya xo şima rê keno eyan >>>>><sup>3</sup> ke şima bizanê ...<sup>4</sup> ke mesela ...<sup>5</sup> ke ...<sup>6</sup> "

<sup>2</sup> Çekuya "çiçi" seba fekê Sêwregî çekuyêka spesîfik a.

<sup>3</sup> Eslê metnî de, tiya de îşaretê winasî estê.

<sup>4</sup> Tiya de yew çekuye nêwanîyaye.

<sup>5</sup> Tiya de di-hîrê çekuyî nêwanîyayê.

<sup>6</sup> Tiya de hîrê -çar çekuyî nêwanîyayê.

Seke ma cor ra zî va bişikbîyayîşê nê metnî de semedo tewr muhîm o yo ke destxeto orîjînal destê ma de nîyo. Labelê çend semedê bînî zî estê ke nê metnî ser o guman virazenê. Înan ra yew goreyê metnê açarîyayeyê tirkî (Dehqan, 2020: 7) de û destxetê rîpelê peyênî de bi nameyê "Osman Efendî" yewî ra behs beno û vajîyeno ke o yo ke meqaleya nê metnî ya dîyine nuşta, nameyê ci Osman Efendî yo. Labelê eynî cayê metnê orîjînalî rîpelê 301î yê bi îngilizkî de herinda "Osman"î de "Sultan" esto. Gelo tercume, metnê orîjînalî ra hîna rast o? Heto bîn ra metnê îngilizkî de nameyê "Usman Farali" vêreno ke eynî name rîpelê 4î de qîsmê tirkî de zî esto û ci ra sey pîrê elewîyan behs bîyo. Eceba no Osman û Usman Farali yo ke ma cor ra behsê ey kerd eynî yê? Bi nê melumatan perso esasî zî no yo ke nameyê "Usman/Osman"î mîyanê elewîyan û şîyan de nêno pîranayene. Gelo 200 serrî verî senî nameyê pîrê elewîyan yan zî nuştoxê înan "Osman" bîyo?

Persêko bîn zî derheqê peydakerdişê metnî de yo ke M. Dehqan vano no metnî hetê yew mucelîdê dîyarbekirîjî ra doz bîyo û nameyê ey Mehmet Yıldız o. Goreyê cigêrayîşan Dîyarbekir de bi nameyê nameyê Mehmet Yıldızî di mucelîdî estê ke ê her di zî ne no metnî dîyo ne zî na mesele ra xeberdar ê.<sup>7</sup> Perso peyên zî behsê kitabêkî de yo ke M. Dehqan vano Sultan Efendî bi nameyê Tarîxê Îslamî kitabêko hîrê cîldan nuşto. Reyna goreyê cigêrayîşan çimeyêko winayên heta ewroyî ca nêbîyo, xora M. Dehqan bi xo zî dudil o û çimeyê ney nêmojneno kesî.

## 1.2. Dr. Robert G. Latham (1812-1888)

Çimeyo dîyin hetê Dr. Robert G. Lathamî ra serra 1856î de amade bîyo. Latham Billingboroung, Lincolnshire de maya xo ra bîyo. Etnolog û filologo îngiliz o. (Lee, 1862: 168). No metnî eslê xo de listeya çekuyan a ke hetê Dr. H. Sandwithî ra neql bîya. Seba ke behsê ey beno derheqê Dr. Humphry Sandwith (1822–1881) de vajîyayo, la eslê ey Bridlington ra yo (Ward, 1884: 2). Arteşa Birîtanya de doktor o û serra 1849î de wezîfeyê serhekîmî ya yeno İstanbul (Ward, 1884, s. 25) û dima zî seba wezîfeyê xo yê hekîmî gama ke ver bî Musilî şîno, rayîrê ey keweno mintiqayanê Kurdistanî. (Ward, 1884: 43) Na liste tewr verî serra 1980î de bala kurdan anta û kovara *Süreçî* de weşanîyaya. (Ward, 1884: 43) Dima eynî serre kovara Tirêjî de hetê Roşan Bariçekî (M. Malmîsanij) ra tayê rastkerdişan reyde reyna weşanîyaya. (Bariçek, 1980: 38-42) Wexto ke kovara Tirêjî de weşanîyaya, nameyê nuştayî çape de "1980' DI ZAZAKI" nusîyayo, labelê mîyanê metnî de tarîx sey kovara yê *Süreçî* 1860 nusîyayo. Kovara *Süreçî* de çapa 1860î ya na liste sey çimeyî mojîyaya labelê eslê xo de na liste serra 1856î de weşanîyaya. (Latham, 1856: 40-42) Alfabeya na liste latînkî ya û goreyê îmlyê îngilizkî nusîyaya. Goreyê nuştîşê ey, Dr. Humphry Sandwithî nê çekuyî fekê "yew kurdê eşîra zaza"yî ra arê dayê. (Latham, 1856: 40) Labelê derheqê mintiqaya arêdîyayîşî ra behs nêkeno. Roşan Bariçek zî goreyê vatişê çekuyan

<sup>7</sup> Çimeyo Fekkî: Bilal Zilan, 13.07.2020

vano ke nê çekuyî tebere mintiqaya Dêrsîmî ra arêdîyayê. (Bariçek, 1980: 38) Goreyê tayê çekuyan merdim şeno vajo ke nê çekuyî mintiqaya Sêwregi yan zî Çêrmûge ra arê biyê.

### 1.3. Peter Lerch (1827-1884)

Çimeyo hîrêyîni hetê Peter Lerchî (Пётр Иванович Лерх) ra serranê 1856/57/58î de amade biyo. Peter J. A. Lerch yan Peter I. Lerch kurdnaso namdar, etnograf, arkeolog o. (Tikhonov, res. 2020) Nê warî de tena kirmanckî ser o ney, kurmanckî ser o zî xebitîyayo. Mabênê serranê 1856-1879î de Petersburg de kitabxaneyê unîversîteya San Petersburgî de xebitîyayo. (Tikhonov, res. 2020) Serra 1850î de Akademîya Zanistî ya Qiraliya Rûsya de beşa Tarîx-Ziwannasîye de wendo. Verî bala ey zıwan û edebîyatê fariskî, efsaneyanê Îranî û sanskrîtîki ser o beno. La dima vînenê ke no war zaf hîra yo, coka vera-vera warê îranolojî de xebata xo kurdan ser o keno xorî. Xebata ey a tewr verêna ke kurdan ser o ya “Eşîrê Kurdanê Îranî” ya. Ê deman de seba ke tayê zanayeyî Kurdan û Xaldîyan (Keldanîyan) girêdayeyê yewbînan vînenê û îdîa kenê ke kokê înan yew o, Lerch zî na rêçe teqîb keno. (Kuriş, Bihar 2013: 53) Demo ke mabênê Împeretoriyanê Rûsya û Osmanîyan de cengê Qirimî beno, eskerê Rûsya tayê kurdan zî hêsîr gênê û berpîrsîyarê Rûsya înan benê Roslawl ke qezaya wîlayetê Smolonskî biye. Mîyanê nê kurdanê hêsîran de hem kirmanckî hem zî kurmanckî estbenê. (Kuriş, 2013: 54) Lerch şino Roslawl û fekê nê hêsîran ra materyalanê kirmanckî û kurmanckî arê dano. Keso ke Lerchî qiseyê eyê kirmanckî nuşte, Kasan (tirkî: Günköndü) ra Hesên biyo. (Lerch, 1857a: XIV, XXI) Kasan, mintiqaya Sîwanî (tirkî: Selvi) de yew dew a ke mabênê erdê Dara Hênî û Palîyî de ca gêna. Verê, resmîyet de Sîwan nahîyeya Palîyî biya ( T. C. İçişleri Bakanlığı İller İdaresi Genel Müdürlüğü, 1968: 695), serra 1936î de hetê idareyî ra biya nahîyeya Dara Hênî. (Şaşmaz, 2014: 86) Dima, goreyê qanûnê (Resmî Gazete, 2014: 41) ke serra 2014î de vurîya, hetê idareyî ra bi dewe. Seba ke serra 2012î de dewî hetê idareyî ra biyî taxî (mehlayî) (Resmî Gazete, 2012:1), Kasan zî nika resmîyet de sey yew taxe girêdayeyê qezaya Dara Hênî ya. Lerch verî ke nê materyalan biweşano, serra 1856î de kovarêk de derheqê na xebata xo de raporêk weşaneno. (Lerch, 1857b: 83-85) Dima nê materyalan verî bi rûskî sey 3 cîldan (Лерх, 1856/57/58) dima zî bi almankî sey 2 cîldan weşaneno. Çapa almankî ra cîldo yewin serra 1857î (Lerch, 1857a) de, cîldo dîyin zî serra 1858î de ginayê çape ro (Lerch, 1858). Ma na xebata xo de çapa almankî sey çimeyî qebul kerde. Alfabeya nê metnî alfabeya latînkî ra virazîyaya û seba ke ahenganê fonetîkan zî bido, bi îşaretanê cîya-cîyayan nusîyaya. Metnanê Lerchî ser o hetê Mehmet Aslanoğulları ra zî xebatêk ameya amadekerdiş. (Aslanoğulları, 2014)

### 1.4. Petko Slaveykov (1827-1895)

Çimeyo çarin hetê Petko Slaveykovî (Петко Славейков) ra serra 1872yî de amade biyo. Petko Slaveykov, Velîko Tîrnovo (kirm. Tîrnovaya Girde, tr. Büyük Tîrnova) de maya xo ra biyo. Nuştox, mîletperwerê bûlgaran û rojnamevano bûlgar o. (slovo.bg, res. 2020) Wexto ke editore rojnameyê *Çitalişeyî* beno serra

1872yî de, badê ke efê menfîyanê hedîseya *Ziştovi* vejîyeno, o nê menfîyan ra derheqê Dîyarbekirî de xeylê melumatî arê dano û înan sey meqale weşaneno. Êdî ma nêzanenê qenaetê ke ez o nika neql bikerî fikrê ey ê yan yê menfîyan ê, labelê bi kilmî vano ke zîwanê kurdan û zîwanê slavkî yê verênî de xeylê nêzdîyîye esta û bitaybetî zî fekê kirmanckî yê kurdkî de. Tayê çekuyî verê kirmanckî ra (çend teneyî zî kurmanckî ra) neql kerdê nuştê, dima miyanê parantezan de bûlgarkîya înan nuştê. Alfabeya na liste kîrîlî ya û goreyê îmlaya bûlgarkî nusîyaya. Çekuyanê na liste ra fehm beno ke çekuyê kirmanckî û kurmanckî kewtê têmîyan. (Yildizhan, 2019: 10)

### 1.5. Dr. Otto Blau (1828-1879)

Çimeyo pancin hetê Dr. Otto Blauyî ra serra 1862yî de amade bîyo. (Blau, 1862: 607-627) Blau Saksonya de maya xo ra bîyo. (Ernst, 1879: 443) Oryantalîst û seyaho alman o. (Hantzsch, res. 2020) Na xebate eslê xo de eşîranê kurdan ser o ya, labelê cayo ke eşîranê Dêrsimî ser o melumat dîyayo fekê Dêrsimî ra zî listeyêka çekuyan îlawe bîya. (Blau, 1862: 627) Alfabeya na liste alfabeya latînkî ya û çekuyî goreyê îmlayê almankî nusîyayê. Seba ke meqaleya xo de Blau bi xo zî îşaretê Quzelçan/Qozlîçanî<sup>8</sup> keno ma şenê vajê ke nê çekuyî fekê Dêrsimî ra arê dîyayê.

### 1.6. Ehmedê Xasî (1867-1951)

Çimeyo şeşin hetê Ehmedê Xasî ra serra 1898î de nusîyayo û serra 1899î de çap bîyo. (Uzun, 2013: 62) Ehmedê Xasî qezaya Lîcê ya Dîyarbekirî ra, dewa Hezanî ra yo. Serra 1863yî de maya xo ra bîyo û medrese de wendo. (Xasî, 1985: 75) Di serrî û di aşmî qezaya xo Lîcê de miftîyî kerda. (Lezgîn, 2009) Xasî erebkî, fariskî, tirkî û kurmanckî (Xasî, 1985: 75) zî zanayêne. Şîrê ey ê bînî zî estê û şîra ey a mulemma seba sewîyeya ey a edebîye bimojno muhîm a. (Kirkan, 2012: 59) Çekuyê ke Mewlîdê Kirdkî ra gêriyayê, eslê xo de xebata M. Malmîsanijî ya çapnêbîyayîye ra yê ke ey bi xo seba na xebate arşîvê xo ra dayî. Metnê mewlîdî bi terzê mesnewî nusîyayo û sey Mewlîdê Nebî (Xasî, 1985: 75) û Mewlîdê Kirdkî (Xasî, 2013) name beno û edebîyatê kirmanckî de metno edebî yo tewr verên o. (Uzun, 2013: 62) Mewlîdê Kirdkî pêro pîya 380 malikan û 760 rêzan ra yeno pê. 14 mebhese xo estê û bi weznê arûzî (fâilâtûn fâilâtûn fâilûn) nusîyayo. Fekê nê metnî fekê mintiqaya xo, yê Pêşê Kevirî yo. (Uzun, 2013: 62) Elîfbaya nê metnî alfabeya kurdkîya ke erebkî ra virazîyaya labelê nuştexî seba ke rehet biwanîyo bi xo zî tayê tesorufî kerdê. Peynîya Mewlîdî de wina vano: [...] Be'da nê bizanîn ma ferq kerdo beynatê “kaf”ê ‘erebî we ‘xeyrê ‘erebî bi hîrê nuqtan.[...] Zey “gişt” û “kişte”. (Xasî, 2013: 52)

### 1.7. Albert Von Le Coqî (1860-1930)

<sup>8</sup> Quzîçan, nameyê qezaya Pilêmurî ya Dêrsimî yo kan o.



Çimeyo hewtin hetê Albert Von Le Coqî ra serra 1903yî de amade bîyo. Le Coq serra 1860î de Berlîn de maya xo ra bî, etnologo alman o. (Moeller, res. 2020) No metn zî sey metnê Lerchî seba ziwanî amade bîyo. Le Coq xebata xo mîyan de hîrê lehçeyanê kurdkî ra nimûneyî dayê. Xebata Le Coqî di cildan ra yena pê. Nê di cildan de metnê kurmanckî û babakurdî [sorankî] zî estê. Cîldo yewin bi herfanê alfabe ya kurdkîya ke erebkî ra virazîyaya, pê aye nusîyayo. (Le Coq, 1903a) Cîldo dîyin zî bi alfabe ya latînkîya ke hetê nuştoxî ra bi îşaretanê fonetîkan reyde virazîyaya, nusîyayo. (Le Coq, 1903b) Cîldê yewinî de bi nameyê “حكايت عمر ابن علي كوسا حكايت ابراهيم پاشا لفظي ظاظا” metnêko kirmanckî esto. No metn derheqê şerê osmanîyan û walîyê Misrî de yo. (Le Coq, 1903a: 72) Eynî metn bi nameyê “Hikayet Umer İbn Elî Kosa Hikayetê İbrahim Paşa Lafzî Zaza” çend cayanê xo ra teber cîldê yewinî ra latînzê bîyo û cîldê dîyinî de nusîyayo. (Le Coq, 1903b: 60) Seba na xebata eya erjaye Unîversîteya Kielî serra 1909î de doktoraya fexrîye daya ey. (Moeller, res. 2020) Le Coqî çend metnî bi Umer İbn [lajê] Elî Kosayî dayê açarnayîş. Yanî metnê kirmanckî yê nê di cildanê Le Coqî, goreyê kirmanckîya Umerê Elî Kosayî yê. Goreyê vatişê nê Umerî bi xo, o çêrmûgij<sup>9</sup> o. Eşîra kosan ra yo. O wext hewtay û heşt serre yo û Şam de, taxa Salihîye de ronîşeno. (Le Coq, 1903b: 63-65)

### 1.8. Xebatê bînî yê ke Mabênê serranê 1798 û 1903yî de Amade Bîyê

Nê xebatan ra teber serranê mabênê 1865 û 1880î de xebatê ke tede kirmanckî ca girewto zî estê. Ma wexto ke na xebata xo kerdêne, ê xebatan ser o zî vindertî. Nê xebatan ra yewine xebata *Dr. Friedrich Müllerî* ya ke serra 1864î de kovarêka akademîke de weşanîyaya. Nameyê na xebate *Beiträge zur Kenntniss der neupersischen Dialekte. III. Zaza-Dialekt der Kurdensprache* yo û na xebate de Müllerî bala xo daya grammer û morfolojîya kirmanckî. (Müller, 1865) Na xebate de Müllerî xebata Peter Lerchî ra îstifade kerdo. (Müller, 1865: 227)

Xebata dîyine hetê *M. Auguste Jabayî* ra amade bîya û hetê *M. Ferdinand Justiyî* ra serra 1879î de St. Petersburg de weşanîyaya Nameyê na xebate *Dictionnaire Kurde-Français* o û nuşteyêko bi kurdkî-firanskî yo. Na xebate de çekuyê kirmanckî manaya xo ya firanskî reyde rêz bîyê. (Jaba & Justi, 1879) Na xebata Jaba & Justi de zî çekuyê kirmanckî xebata Peter Lerchî ra gêrîyayê. (Jaba & Justi, 1879: XIV)

Xebata hîreyine hetê *Ferdinand Justiyî* ra serra 1880î de St. Petersburg de ginaya çape ro. Nameyê na xebate *Kurdische Grammatik* a û ca bi ca seba ke lehçeyanê kurdkî bidê têver, tede çekuyê kirmanckî zî peyda benê. Ma na xebate de zî vînenê ke *Justi* çekuyê kirmanckî xebata Peter Lerchî ra girewtê. (Justi, 1880)

Nê her hîrê xebatan zî seke ma cor ra zî vato xebata Peter Lerchî ra îstifade kerda û coka eke yew xebata newîye ra zafêr sey çimeyê dîyinî bêrê hesibnayîş, xelet nêbeno. Aye ra ma nê xebatan ra çekuyê nêgirewtî, labelê seba ke nê zî ê serran de ameyê kerdîş û bala xo daya kirmanckî ser, ma ê zî kontrol kerdî.

<sup>9</sup> Çêrmûge qezayêka Diyarbekirî ya.

## 2. Alfabeyê Ke Nê Metnan De Şuxilîyayê

Nê 10 metnanê kirmanckî de hîrê alfabeyê cîyayî şuxilîyayê. Nînan ra Sultan Efendî û Ehmedê Xasî alfabeya erebkî; R. G. Lathamî, Peter J. A. Lerchî, O. Blauyî, A. von Le Coqî alfabeya latînkî; Petko Slaveykovî zî alfabeya kîrîlkî şuxilnayê. Ma do cêr ra bi tabloyan nê alfabeyan rêz bikerê. Nuşteyê Petko Slaveykovî ra teber, ma do alfabeyanê nuşteyanê bînan xebata *Bi Tarîxê Nusîyayena xo ya Tewr Kehene Çekuyê Kirmanckî (Zazakî) (1798-1903)* ra bigirê û neql bikerê. (Yildizhan, 2017: 21-30)

### 2.1. Herfê Nuşteyê Sultan Efendî û Mewlidê Ehmedê Xasîyî

Herfa Alfabeya Ewroyine ya Kirmanckî (Zazakî)	Sultan Efendî & Ehmedê Xasî	Afabeya Transkrîp- sîyonî <sup>10</sup>	Nimûne	Wendişê Çekuye	Manaya Çekuye bi Tirkî
a	ا	a	ا از قس (r. 3)	ez qesem ... kena	yemin ederim
	ا	a	ا انخا (r. 2, 7)	ancax	ancak
	ه	a	ه (r. 6)	heta [heta]	-e dek
	ا	a ['a]	ا (r. 2, 4)	am ['am]	genel
b	ب	b	ب (r. 22)	berd	götürdü
c	ج	c	ج (r. 12, 16)	can	can
ç	چ	ç	چ (r. 2, 4)	çende	birkaç
d	د	d	د (r. 8, 12)	dare	ağaç

<sup>10</sup> Goreyê transkrîpsiyonê M. Malmîsanijî.

e	ـ	e	اَسپار (r. 23)	espar	atlı
	ه	e	اَشْمَه (r. 17, 18)	aşme	ay (30 gün)
	ع	e [‘e]	عَرَبَه (r. 5, 12)	eceb [‘ecêb]	acaba
ê	ـ	ê	رُوحِ وَك (r. 16, 24)	rocêke	bir gün
	ي	ê	نِي (r. 19, 22)	nê	bu
	ـ	ê	سِيمَر (r. 17)	sêm	gümüş
	ه	ê	شِيمَا بِيَانَه (r. 11)	şima bizanê	bilesini z
f	ف	f	زَاف (r. 17, 24)	zaf	çok
g	گ	g	گِرَوَت (r. 11)	girot	aldı
	نَک	g	نِنَک (r. 2, 25)	linge	ayak
	گ	g	شَاغِرْت (r. 11)	şagirt	öğrenci
h	ه	h	هَمِه (r. 11, 25)	heme	hepsi
	ه	h	هَاز (r. 10)	haz	sevgi
	ح	h [h]	حَرَف (r. 7, 8)	harf	harf
i	ـ	i	چِرَا (r. 8)	çira	çira
î	ـ	î	اَبْتِدا (r. 2)	îbtîda	başlam a
	ي	î	پِي (r. 10)	pî	baba
	ب	î	جِنِب (r. 10)	cînî	kadın

	ا	î	(r. 19) جِنِب	cîni	kadın
	ء	î	(r. 19) كِرْدِي	kirdî	Kırman cca (Zazaca )
	اِي	î	(r. 10) اِيْتَا	îta	bura
	ء	î [’î]	(r. 7) جَزِيءٌ	cuzi [cuz’î]	azıcık
j	ژ	j	(r. 18) مُجْدِيَانِ	mujdyane	müjde
k	ك	k	(r. 10) مَكْس	eks [’eks]	akis
l	ل	l	(r. 8, 11) شَكْل	şekl	biçim
m	م	m	(r. 2) مَا	ma	biz
n	ن	n	(r. 3, 6) نَام	name	isim
o	و	o	(r. 16) دَوْر	dor	çevre
	لَو	o	(r. 11) لَو	o	o
p	پ	p	(r. 12, 22) رِه پاپ	pey	arka
q	ق	q	(r. 22) قَبِج	qic	küçük
r	ر	r	(r. 2, 6) رَا	ra	-den
s	س	s	(r. 8, 25) سِر	ser	üst
	ص	s [ş]	(r. 16) صِيْد	seyd [şeyd]	av
	ث	s [ş]	(r. 23) اَشْر	eser [eşer]	iz (nişan)
ş	ش	ş	شَشْ اَشْمَه	şeşaşme	altı aylık

t	ت	t	(r. 18) تَافِلْ	tavil	aniden
	ة	t	(r. 5, 12) بِرْكَة	bereket	bereket
	ط	t [t̤]	(r. 28) بَاطِلْ (r. 21)	batil [batil]	batıl
u	ـ	u	دُنْيَا (r. 4, 4)	dunya	dünya
	ـ	u [‘u]	عَمَانْ (r. 9)	uman [‘uman]	büyük deniz
